helbest

HACÎ QADIRÊ KOYÎ

DÎWAN

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

Dîwanî Hacî Qadirî Koyî

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Dîwan

HACÎ QADIRÎ KOYÎ
(1815–1897)

NEFEL
Stockholm
2004

www.nefel.com
info@nefel.com

Hacî Qadirî Koyî: Dîwan

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Nefel

Çapa dîjîtal: 2004
ISBN: 91-89687-19-1

Edîtor: Arif Zêrevan
Serastkirina latîniya kitêbê: Newzad Hirorî

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Metnê vê Dîwanê ji berhevoka
Serdar Hemîd Mîran û Kerîm Mistefa Şarezayî
– ko sala 1986-ê li Bexdayê çap bûye – hatiye wergirtin û transkrîbe kirin.

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

nêwerok

Pîtî a 9
Gutim be bextî xewallû 9
Ewe şahenşeh e 14
Bestey zullfî nîgarêkim 15
Ta le mekteb ew mehem dî 16
Temenneytu mîne ddehr 17
Ke tofanî siruşkim kewte xewxa 18
Dexîlit bim were saqî 19
Dill hîlakî nazit e 20

Pîtî e 21
Zemane 21
Em xeyme ke şemsîyey 22
Dalî qedim 24
Eger cur'ey reqîbit 25
Basî bawkî meke 26
Eger xallit billêm 27
Ey Muhemed 28
Ew felek rîf'ete 29
Bay we'de 30
Ta gullî ruxsarî to 31
Dulberim Mamzîye 32
Temaşay qametim 33
Cehlî îşkalî mesaîl 34
Rostemî mazenderan 35
'Esa û qametim 36
Xezneyêk e beytî min 38
Xem mexo bo nan û xwanit 39
Qîssey şebî hîcranî 40
Le ser şew rojî danawe 41
Be rux û zullfî şew û rojî 42
Le dewrî xallekey kullmî 43

Le dû la ejdîhay zullfî 44
Qeseyêkim heye 45
Le nezaket kemerî 46

Pîtî ê 47
Aftabî husnî to 47
Êmeş demirîn 48
Metnî kutubî em dere 49
Ey Suleymanî zeman 50
Dellên yar dêtewe 51
Ger xellqî cîhan 52
Wa dîyar e.. 54
Hebîbî can 57

Pîtî î 58
Ey bê nezîr û hemta 58
Asmanî bêstûn 59
Eger kurdêk qisey babî nezanî 60
Perêşan zullfî tatarî 62
Sofî be ser û rîşî 63
Bem nehiwe ye serfî îşqbazî 64
Ta salîkî mesalîkî 65
Ke hesta qametî berzî 66
Le ser tenafî ke lerzî 67
Sed weku Rostem 69
Hemû ‘umrim 70
Neqqaşî demî 71
Meh û mîhrî be xaret da 72
Le ‘eynî le’lî kanî 73

Pîtî k 74
Ta billêy ferqî heye 74
Le gawan û şiwanî kurdekan yek 75

Pîtî m 76
Cîhan bûyte cezîre 76
Weha meşxûllî to ye 78

Wekû roj û şew e 79
Be şestî zullf û rûy mahî 80
Dûsed gunahî heye 81

Pîtî n 82
Em seganey 82
Xakî Cizîr û Botan 83
Le Roma kewte ber çawim 87
Perçem û fêsî keçî 89
Felek be tîr û kemanî 90

Pîtî r 93
Em ahuwe 93

Pîtî s 95
Wişke sofî 95
Destî min damênî to 96

Pîtî t 97
Mematim heyat e 97
Mahî ser çawey heyatim 98
Be qisey bê ser û pa tallî meke 99
Ceberûtî ke şika 100

Pîtî û 101
Eger lêdane meqsûdit 101
Umêdî weslî tom zanî 102
Bûkî dinya 103

Cûtserwakan 104
Udeba çak e 104
Ya îlahî 109
Ew roje 110
Ta rêk nekewin 113
Tacî bismî llahî rrehmnî rrehîm 115
Şêx Bizeynî 120
Xo dezanin sulaley ekrad 122

Hakim û mîrekanî Kurdistan....124
Xusrew û Keyqubad....126
Şehsewarî belaxetî kurdan....128
Selamu llahî minnî kulle yewmîn....135
Şa'îr û şêx û xiwace derbeder in....138
Kurdekî koyî....140
Le cumley maceray....143
Le meydanî behara....148
Were seyrî bizane lawî koyî....152
Her kurd e....156

Çiwarîn û parçe hellbest....158

Şî'rî taktak e....161

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Pîtî a

Gutim be bextî xewallû

Gutim be bextî xewallû bese etûbî Xuda
Le xew helliste zemanê biçînewe ew la

Gurrey beharî ye êstêke şax û daxî willat
Pirr e le lalewî nesrîn û nergsî şehla

Le girmegirmî sehab û le hajey baran
Çîya ye pirr le herwa û niwall e pirr le seda

Pirr e le seyl û le golla û kanî rûy zemîn
Pirr e le berq û birîqey birûske cewî sema

Şkofe dirhemî şabaşî bayî we'de deka
Le şewqî meqdemî xemllîwe dar û berdî çîya

Pîyalleyî zerrî nergis le ser kefî sîmîn
Pirr e le şebnimî wek durr û lu'lu'î lala

Gullîş bî penceyî feyrûz e camî yaqûtî
Lebo nîsarî muhayya ye pirr le zerrî tella

Le şadî wek sefî şayî le kêwî kej ezhar
Heja be xel'etî gulgûn û kewte reqs û sema

Çemen le lale mîsalî xetî ruxî dulber
Sîyah çadirî lê bote xallî ser gona

Le kin binewşe û xaw û hellall û beybûnî
Hellallî pêsteyî xaw e ‘ebîr û muşkî xeta

Çîya le tewqe serî darrijawe ta kemerî
Çu zulfî sunbulî derhem, çu perçemî berreza

Be coşî agirî gullnarî kanî helldequllê
Mîsalî dîdeyî Wamîq le hesretî ‘Ezra

Qellatî zîwî ruxawe heres be topî nesîm
Supahî lale û gull çadirî le cê hellda

Le goleşînê ke qaz û mirawî dên û deçin
Nezîrî mah û sitare n le qulzumî mîna

Şiney nesîm e seday awî safî ser qellbez
Be wirşewirşî giya şengebî buwe şeyda

Xirîng û horrî qullîng û qetarî sî le seran
Deyêt û kew defirrêt û şehîn çirîke deka

Le pîrepîr û le simkollî pîrega kêwî
Delerzê gawî zemîn û detirsê gawî sema

Le deng û dûkellî şînî tifengî nîçîrewan
Mîsalî sunbulî zullfî ke têk biçê be seba

Çîya ye şêx û keway sewz e, mêzerî befir e
Sîwakî çûzere rêwas e, teylesanî gella

Çemen le lale û reyhan û nestere n îmrro
Supîhr û subh û şew e û aftabî wextî zuha

Çinar û ‘er’er e defzen hezar e nexmeseray
Gîyaşî zakîr e tesbîhî şebnimî lemla

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le jûrî mêgelî hewr e, le jêrî mêgelî merr
Şebîhî gulşenî xezra ye tûdeyî xebra

Le kêw û kej ke ser êware dêtewe mallat
Le dewrî çadirî sahêbî mewcî da westa

Le hîlehîlî kehêl û le barrebarrî merran
Le dengî qurreyî gacût û burreyî manga

Le gurgelûr û hepey seg, le qarreqarrî bizin
Le ‘eksî dengî dûbarey ke dêtewe le çiya

Le oheohey gawan û qîrreqîrrî şiwan
Le bigre-berdey kaban debête heşr û hela

Mela’îkey serî taq û rewaqî mînayî
Debête cunbuş û lerzîn, dekewne hewlewela

Ke hellkira şewê agirî le kullî reşmallek
Xicil debin le zewayay xeymeyî wala

‘Utarîd û zuhel û aftab û mahî temam
Xulase sabît û seyyare ta degate suha

Seba dezanî jiyanim le dûrîyan merg e
Desa were be kizey xot xicil bike Îsa

Eger min im le fîraqyan kizem le cergewe dê
Eger dill e weku cergim dellêy ewa sûta

Le paşî em hemû dastane bextî xwab alûd
Mîsalî ejderî nûstû be riq le xew hesta

Cewabî damewe emma cewabekî wa req
Nema mecalî meqal û mubahese lem la

Gutî hetaku xezan û behar û zistan e
Medarî eyşî mewalîdî ‘alemî xebra

Beharî wa hemû sallêkî dêtewe emma
Ewanî deçine diyarî memalîkî ‘uqba

Yekêkî nayetewe; çûnyan her ew çûn e
Le şêx û ‘alîm û cahîl, le padşah û geda

Mekan e, şewqî be ‘êlat e, peşme kone hewar
Heyat e zewqî beehbab e, baye ab û hewa

Rifîqî kone nemawin, ciwanekan pîr in
Be şeq derron û le darî diyar e şeqqî ‘esa

Le dûsedî yekekî zehmet e binasîyewe
Meger be naw û nîşan û be xizm û bab û bira

Ke bêyî û biçiyewe êsta ke’ennehu dîsan
Sefer dekey le weten deçiye şarî Cabulqa

Xulasey qise êstêke mesllehet eme ye
Billêy be wechî nesîhet, be kaxez û înşa

Eman kurranî refîq û biraderanî willat
Be êwe her ke geyî em kelamî bî serûpa

Le paş ewey ke tesîhe û mutalle’ey bikrê
Be yadî min le berî ken le rûy mîhr û wefa

Heta le xîttey bêgane fexrî pêwe bikem
Le beynî zumrey ehya û mecme’î mewta

Winî meken weku asarî Nalî û Kurdî
Le sehwî dîde bipoşin, guzer biken le xeta

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Nîye le mumkînî îmkan xeta û sehwî nebê
Be xeyrî xwacey dîwanî ‘ellemel esma

Ewî hesûd û cehûl in, leîm û rexnegir in
Le ‘eyb û rexney ‘alîm berî debin udeba

Emane zadey efkar û xoşewîstî min in
Eger qebîh û kerîh in, eger şel û e’ma

Mîsalî ferxey jîşk ke pêy dellê daykî
Îlahî qaqum e ya xez, semûre ya dîba

Şebîhî colle ke razî nebê be serdirî xoy
Mellên fesahetî kurdî be farisî naga

Belaxetêkî heye, hîç zubanê naygatê
Le bê te’essubî kurdane bê rewac û beha

Ke xotî tê negeyênî, le nîktekanî negey
Dellêy hemûy hezeyan e, Xuda bellay lê da

Bellam ewanî ke serrafî zêrr û zîwî qisen
Be şehrewayî dezanin, çi sikkeyêke rewa

Çi hîkmetêk e ke asarî kurd e namûsî
Ne kîmîyaye ne ‘enqa le beynî ême nema

Îlahî neyxeye ber çengî mendebûrî leîm
Niqûdî Hacî ke neydîwe Xusrew û Dara

Umêdî wa ye nesîbî kerîmekî wa bê
Be xêrî daykî û babî le rêy xu da bîba

Gelê qisem le dilla bû, hîkayetim mabû
Keçî le bextî keçim xame nûkî lêre şka

Ewe şahenşeh e

Ewe şahenşeh e bo ‘ebd û paşa
Mu’elleq xeymey eflakî hellda

Eto mesnû’î, çît dawe le sanî’
Le zanînî ewe nadan e dana

Mu’emma ye cîhan îsmî mu’emma
Mekanî îsm e nek cêgey musemma

Be bê dîn î cemalî bê qerîn î
Xelayiq ser be ser îmanî hêna!

Be ba zullfî ke lerzî ta be ta bû,
Le gell lerz û le gell ta bûne hemta

Mutallay dewrî zulfeynî muselsel
Ewendem kirduwe lêm bo be sewda

Le dewrî durrî dindanî beqîmet
Didanî kenduwe lûlûy lala

Le lay min peşm e em zexme heta key
Be zaî’ naçê em sebre le lay Xuwa

Zemanî hall e Hacî hasilî to,
Debête diwênê emrro mîslî ferda

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bestey zullfî nîgarêkim

Bestey zullfî nîgarêkim resenbazî deka
Seffî mujganî le tabûrî supay xazî deka

Samîrî gosale ye turreyî ke terrarrî deka
Sahîrî eslî heye xemzeyî ke xemmazî deka

Herweku ʻÎsa le ser behrî hewa kewte sema
Herçî mûsayî nebê çon nefyî îʼcazî deka

Min feqê m û xeyrî sîparem le baxell da nîye
Ew kesey sahîbqiran e îddîʼay xazî deka

Saxî lem rêgaye da karî le dîn çî? Sadiq e
Her kesêkî ʻaşîq e elbette enbazî deka

Dill ke derbendî heya û neng û nam û ʻarî ye
Ew qisûrî kirduwe dê arezûy nazî deka

Seyrî lew tennazîye qazî be miftî nakirê,
Sofî îmanî deda Hacî be giyan razî deka

Ta le mekteb ew mehem dî

Ta le mekteb ew mehem dî meşqî elfûbê deka
Çawekem bûyte diwêt û girye surxî tê deka

Lêy mepirse mes'eley nuqtey dem û mûy kemer
Mûşkafe, bo Elî basî perî û cîn çê deka

Em hemû dinyaye xasî hukmî dû dêwane ye
Min le şarim xayetî mecnûn heway ladê deka
Qesrî 'umrim datepî darî le ser berdî nema
Banîy tûlî emel îstêke destî pê deka

Xiwace xoy pîr e, wecaxî kiwêr e, mallî bêhîsab
Pêm billên, îşkalme, em koşişeyî bo kê deka?

Şêxî min bew xayete piştî le 'alem kirduwe
Suretî xoşî le nêw awêne piştî tê deka

Maçî dest û pêy emîrî destgîrî hazir e,
Şêt e Hacî maçî lêwî destî dest û pê deka.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Temenneytu mîne ddehr

Temenneytu mîne ddehrî nîda'î ezmîna nadî
Gutî: Herçî temennakey le dinya xeyrî min nada

Le sayey zulfî efşanî perêşan dê xetî manî
Le teswîrî eger carê be westayî qellem dada

Xetî dewrey ruxî dawe weku mûrî Suleymanî
Xeyallî kirduwe zullf be hîle xatemî la da

Le jêr qafî fîraqî da weha fersûde ye cîsmim
Le gell 'enqa qerîn im min le îsmî bêmusemma da

Xedengî dîqqetî Hacî qesîmî cewherî ferd e
Keçî wesfî demî her ma le jêr perdey mu'emma da

Ke tofanî siruşkim kewte xewxa

Ke tofanî siruşkim kewte xewxa,
Be meh mahî gutî: Ya hafîz Ella

Emin ‘enqatir im boçî zebûn im
Le lam wek qaf e barî tenkî Esma

Dezanin min ke bê dar û diyar im
Segî mecnûn im û xemxwarî Leyla

Le dinya her kesê meqsudî îşq e
Bika wek min be kullî terkî dinya

Ke dayhêna û hellî naçawî mestî
Rewan fîda dekem dill çakî hêna

Felatûn to dellêy dinya qedîm e
Le ximxanet binên wek xot le xim na

Edî boçî zemînîş bote gerdûn
Le seylî eşkî tundî bê muhaba

Musillmanan suxen serbest e ta key?
Le dest ew kafirî bêdînî tersa

Le herdû lawe zullfî kewte gerden
Ne lem la derdeçê Hacî ne lew la

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dexîlit bim were saqî

Dexîlit bim were saqî edîr ke'sen we nawîlha
Xem û xussey dillim kem bû welê eftad muşkelha

Umêdî mîskî muşkîn im seba zan terre biguşayid
Ke çî nemzanî bem derde çe xun eftad derd leha

Le behrî 'îşq û xewfî mewc û girdab çinîn haîl
Be hawarî dillim nagen sibikbaran sahilha

Le ewwell 'îşqî win kird û be bednamî keşîd axir
Çi lon penhan debê sîrrê ke zu sazend mehfelha

Billê bimire debê bimirî gert pîr muxan gewîd
Ke çunke xoy xeberdar e ez riwah ve resim menzilha

Le hîcranî eto bo min çe emin û 'eyş çun herdem
Ecel bangman deka zû ken ke ber bendîd mehmelha

Eger tu muxlîsî 'îşqî az ve xaîb meşu hafiz
Ke Hacî bo sefer birrwa de' eddunya we emhîlha

Dill hîlakî nazit e

Dill hîlakî nazit e ba xemze tedbîrî neka
Her debê bimirê meger Xellaq teqdîrî neka

Ey qîyamet qametî toba qîyamim heste ta
Da'îyey berzî le gullşen serwî kîşmîrî neka

Min xewî ew çawe erzî Îbnu Sîrînim dekird
Nûst û fermûy: Hîç kesê tefsîr û te'bîrî neka!

Min le sayey em dere narrom heta rojim neyê
Ba be keyfî xoy bika, bedkar û teqsîrî neka!

Çunke nirxî maçî toy gorrî hemû deste û du'a n
Xettî newxêzit weku zullfit Xuda pîrî neka!

Pêy billê badî seba xem lêre bê kes kewtuwe
Dill bu xemxwarî emane, lehzeyê gîrî neka!

Naheq e ew derheqim key deygirê mîzanî heq
Katibî e'mal eger bêt û terefgîrî neka

Xeyrî dill mawêje kes tîrit le rohî min kewê
Ta be coşî xwênî Hacî sîne kewgîrî neka

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pîtî e

Zemane

Zemane resmî caranî nemawe
Çiraxî nazim û munşî kujawe

Le dewrî ême roman û cerîde
Egerçî meqsed e, zanînî baw e

Eman qedrî bizanin em kitêbe
Le dinya êstekî hemtay nemawe

Le eyyamî heyatî şêxî Xanî
Le ser nusxey xetî ew nûsrawe

Le lay erbabî xoy bo qedir û qîmet
Xezîney gewher e û kîsey diraw e

Le mecmû'î duwel Soran û Botan
Le sayey em kitêbe nasraw e

Le kurdan xeyrî Hacî û şêxî Xanî
Esasî nezmî kurdî danenawe

Em xeyme ke şemsîyey

Em xeyme ke şemsîyey şahenşehî erze
Ta çadirî nîlûferî ser teplekî berz e

Etnabî weku tûlî emel la mutenahî
Ewtadî weku kêwî Uhud merkezî feyz e

Seqfî weku gerdûn e, şkafî weku encum
Perdey weku edwarî sema etllesî sewz e

Herwek elîfî can e stûnî le sikûn da
Nek tabî'î xeyr e muteherrîk weku hemze

Ewsafî weku xettî dû zullf e be çep û rast
Wek marî mutelsem ke telîsmî serî kenz e

Wesfî çi bikem? Nêwenî gull, damenî sunbul
Şayist e sanexwanî bikem herweku ferz e

Lay jûrî semen nêwenî gull damenî sunbull
Lew sûret û me'na ye ke sed cennetî lexz e

Fîlcumle weku xallî ruxî dulberî Hacî
Dillpest e, desa badî seba heste melerze!

Her lêre heta deştî beheşt ayinî lacan
Ahîste birro nek weku dêwaney herze

Ta daxîlî xellwet debî emca be wekalet
Xakî qedemî maç bike bem terze ke terz e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Me'zûnî ewende weku ahim be nezaket
La dey serî zullfî ne weku bîxeye lerze

Em new'e gulle hell dekewê sallê le qerrnê
Nek wek gullî bazarrî ye hersalle ke sewz e

Dalî qedim

Dalî qedim ke elfî esay girt be deste we
Tîr û kemane, seydî cewanîm nebestewe!

Ey peykî nale bênî serî zullfî bêne çeng
Ger xakî pêy dellêy, hemû dem wa be deste we

Gawî felek be barî xemî zig dehênte erz
Min çûme jêrî bê gile bem cîsmî xeste we

Bo qesrî wesfî ew mehe mî'marî fîkretim
Westawe kullî lehze be xoyî û kereste we

Qurban reqîbî seg ser û çawî şikandûm
Çon bitgemê be pêy şel û destî şkeste we

Ew newrresey îcarey miskênekan deka
Heccac e gerçî seyîd e bem xurc û heste we

Ta subhî gerdenî le şewî zullfî hellneyê
Hacî mellê be talî'î nûstû: Hellistewe!

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Eger cur'ey reqîbit

Eger cur'ey reqîbit la gullaw e
Nekey bîxoyewe pîs û gillaw e

Le nexmey mutrîb û meydanî saqî
Birînim kewte so, daxim kulawe

Le rêgey to ewî bê pa û ser bê
Pilluqey kewş e, ferqî bê killaw e

Mellê nayxwêntewe namey fillanî
Le birjan û le sûtana kullawe

Be yadî kuncî to Hacî weku bûm
Le me'mûre deçête naw kelawe

Basî bawkî meke

Basî bawkî meke, aramî nîye ew terese
Rojê casûs e, be şew ta be sibeynê ‘eses e!

Nakirê medh û senay to be zuban û be qellem
Heq e medhit nekem û qafîyezanîm ‘ebes e

Şêr weku mûr e le lay zullfî kemend endazî
Fîle mêşûle ye, lêy la bide, ‘enqaş meges e

‘Adetî girtuwe ‘uşşaqî nebê hellnaka
Werine bo kuştinyan, nîme nîgahêkî bes e

Lêwî wek qende mukerrerr le dema şîrîn e
Bo ye tekrar e weku nalle enîsî nefes e

Çûne jêr barî rîyaset kerî û ehmeqî ye
Le qetarîş ewî pêşeng e ‘elawey ceres e

Bûmî wêran e be roj û segî ew ko ye be şew
Herdûkî xizmî yek in, Hacî be bê xizm û kes e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Eger xallit billêm

Eger xallit billêm mîşkî xeta ye
‘Ezîzî min emem ‘eynî xeta ye

Le ber newxêzî sebzey dewrî lêwit
Tenim kahîd e mîslî bergî ka ye

Dellên ‘ennab û şekker çak e bo derd
Gullawî lêwî to bo min şîfa ye

Tebîbim hate balînim wehay gut:
Dirêxa derdî ‘îşq e, bêdewa ye

Eger kufir e billêm min mubtelatim
Were sa bimkuje bîlla xeza ye

Ewe xall e le ser gonay şerîfit
We yaxud daney dawî bella ye

Xemîde qametî dawî xemî tom
Emendey rast e Hacî bê rîya ye

Ey Muhemed

Ey Muhemed wey emînu ddewle îmrro ko yî to
Cennetêk e kewte dozex herçî lêy dûr kewtewe

Muddetêk e derbeder gerdî diyarî xurbet im
Bende yadî astan bosî etoy kird hatewe

Çunke tuhfe lazim e her kes le xurbet bêtewe
Bem dû ferde min qezay sed gone tuhfem kirdewe

Qaweçî bezmî eto dinya ye, sînî asman
Aftabî zerf e, fincanî meh e, qawey şew e

Ew şewe bo her kesê dunya bikate rojî rûn
Şew le xîttey ‘umrî ew ‘enqa ye derbanî xew e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ew felek rîf'ete

Ew felek rîf'ete her lehze nîqabêkî heye
Kê dezanê weku min xane xerabêkî heye

Rast e dill xestew û bêçar e weku nergisî to
Nergisî mestî eto bes nîye xwabêkî heye

Şem'î min serzenşî qet meke perwane eger
Êste xamoş e şew elbette cewabêkî heye

Şî'rekanim ke xerîbî weten û new û sefer in,
Were bîxûnewe em nuqte sewabêkî heye

Qedrî Hacî bigrin meqsedî her dîde nîye
Werine herçî bigrî nanek û abêkî heye!

Bay we'de

Bay we'de befrî birdewe, yexbendî kirdewe
Gull şem'î pê kira, şererî cemre mirdewe

Espî reş û spî begirew xar deden be taw
Wek roj û şew, diyar e le şew roj debatewe

Bulbul dexwênê, ba le defî bergî gull deda
Xunçe le batî giwê bigrê, dem dekatewe

Nergis le mêrxuzar dezanî be çî deçê
Binwarre asman le şewa eynî hî ew e

Tamî nemawe qîsse û furset xenîmet e,
Me'lûmî xas û 'am e heçî çû nehatewe

Mîslî şerarî kaxez e sûtawe 'umirman
Romî ke defi' bû girêy dill defi' debêtewe

Lem weqte her kesê weku Hacî le gullşena
Destegullî be desteweye destî birdewe

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ta gullî ruxsarî to

Ta gullî ruxsarî to wek min hezarî ‘aşîq e
Rastîy qeddit le ser ser û sinewber faîq e

Ba le herdû la be zullfit baweşênî lê neka
Mêşî xallit nafirrê pabendî şehdî raîq e

Boçî gull pê nakenê ahim sehabî baxî ye
Girye baranî behar e, nalle re’dî barîq e

Şew le daxî ‘arîzit, rîşî spî bû asman
Ger dellêy kezzab e ha burhanî subhî sadîq e

Sunbulî zullfit perêşan e, qedî serut billind
Dill perêşanî pesend e nalebarî laîq e

Hasilî wesfî gullim nayête ser hedd û beyan
Şîrînî Ferhad e, Leylay Qeys e, ‘Ezray Wamîq e

Min debê bimirim eger men’im neka Hacî le xoy
Ba cewabî len teranî, xerre Mûsa saîq e

Dulberim Mamzîye

Dulberim mamzî ye, bazî be reftarî kew e
Ey dillî xeste weku gurbe be şiwênî mekewe

Daxdarî ruxî ye laley hemra le çemen
Nergis e çaw le berî xemzey xemmazî ew e

Çî le min dawe le ecel heqqî nîye bête serim
Xom esîr im, dille nezr e, ewe canîş girew e

Hez dekey subhî qîyamet le şewa derbikewê
Pêy billê: Dugmey awêney sînet bikewe

Seferî zullfî meke Hacî şewit lê degerrê
Ba wicûd roj e le lat wa ye ke tarîke şew e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Temaşay qametim

Temaşay qametim pîrî çi lon tîrî ‘esay daye
Diro ye darî gewre wek nemamî taze dana ye

Riqî lême felek, saqî kerem fermû reqî bêne
Riqî wişkî le to naye eman mutrîb le to naye

Le dinya emtî’ey weslî le gell min nakirê sewda
Hemû çîn û xeta lem la le zulfî lam hiweyda ye

Kelîm e ew deme, zullfî ‘esa ye, xettî fir’ewn e
Yedî beyzayetî gerdin, cebînî Tûrî Sîna ye

Suleymanêk e Nalî xawenî dîwan û ferman e
Nîye kes bête meydanî meger Hacî xud asa ye

Cehlî îşkalî mesaîl

Cehlî îşkalî mesaîl wa xetî zanînim e
Zullfî to qeyd û hewaşîy sîlsîley ahînim e

Dexllî xercî xom e baranî nebatanî zewî
Hewrî payiz rûyî sûtan Xusrewî hawînim e

Xame daxwazî deka ebkarî me'na, pêy dellê:
Rûsyahî dû ziman qet'î sert kabînim e

Rojî hîcran meylî exyarî hebû ha bimkuje
Hamîlî barî xemit her gîyane çaw xaînim e

'Ezmî tabûrî sefî mujganî to bom hat be taw
Hêrişî bo tel'ey îman e ya ayînim e

Seyrî Hacî kirduwe yar hat û êsta deykujê
Ya Xuda wa bê emin çend sall e wa amînim e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Rostemî mazenderan

Rostemî mazenderan ew weqte destî birdewe
Hate rêy Dêwî Spî azane destî kirdewe

Her weku şaranî tir kes aşnay Koyê nebû
Şuhretî ebyatî min xellkî le ser ko kirdewe

Her kesêkî daye ber şeq zallî dunyay denî
Goy le meydanî cewanmerdanî ‘uqba birdewe

Em hemû zullmey reqîb kirdî le axîr dulberim
Mallî awa bê be maçî lêwî tolleyî kirdewe

Dastanî hîcrî min şerhî be nûsîn nakirê
Pêt dellêm çon e eger çawim be çawit kewtewe

Ahî min sûr e, çiya wek loke hellacî deka
‘Uqdey zullfî girêy mûyîne ba naykatewe

Her ke bîstim pêm dellê: Hacî segî derganem e
Min le tirsî gurgî bedkarim kerî xom bestewe

‘Esa û qametim

‘Esa û qametim tîr û kewan e
Ke çî dill talîbî rewtî kewan e

Eger cem’î weku ‘eqdî sureyya
Perêşanit dekem wek heftewane

Heta key herweha şeqqey simit dê
Xem û xussey cîhan barî giran e

Didan û mûy serî wek kuhne pîran
Nîşaney daweşan û hellweran e

Cewanî wek ciwanî kewte dawî
Lixawî rîşî ye, zînî rewan e

Be ser çû xettî sebzî, mirjde ey dill
Demî dirwêneye û xerman û dan e

Ewî xoşim dewê mîslim nedîwe
Be xeyrez xoy le jêr em asmane

Le beynî zullf û xall û nûnî ebro
Be elfî qametî canî cîhan e

Le herdû lamewe zullfî du lane
Esîrî kirdim û bê aşyan e

Le Roma ger meta’ê bê tema’î
Be xorrayî biden hêşta giran e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ebûzer malîkî dinyay e lêre,
Ewî xazîy heye sahêb qiran e

Eger tuccarî Hacî pare bêne
Meta'e nêk û bed, dinya dukan e

Le bo 'uqba bizane kam be kell dê
Eto muxtarî êsta lem mîyan e

Xezneyêk e beytî min

Xezneyêk e beytî min dû mîsre'im daxistuwe
Kes tema'î tê neka rêgay dizim lê bestuwe

Bîke ber dîbay nezmim ta qîyamet nadirrê
Çunke ebkarî me'anîy tar û popî ristuwe

Zahîra beytim le Nalî û Kurdî zor kemtir nîye
Tali'im bergeşte ye, bedbext e bextim nûstuwe

Basî hûr û basî xîlman û perî bo min meken
Wek mehî bêmîhrî xom nem dîtuwe û nem bîstuwe

Nîwe şew ger derkewê wek mahî sekel tel'etî
Wa dezanin aftab û muşterî ser bistuwe

Dest û pêy ew padşahî husne kiwêlem pê dellên
Hênde engustî peşîmanîm le hesret gestuwe

Dill le kuncî sîne da ger xwên denoşê û xem dexwa
Hacî bo qurbanî 'îdî weslî to daybestuwe

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xem mexo bo nan û xwanit

Xem mexo bo nan û xwanit xellqî hêşta nustuwe
Zallekey dinya tenûrî meşrîqî daxistuwe

Bêxewîm dayê nexoşîm lê kirrî çawî keçî
Wek min û bextî sîyahim her nexoş û nustuwe

Lêt deşêwê her ke zulfeynî peşêwî la bida
Mahtabî serkel e ya rojekey ser bistuwe

Dulberim bermamkî dabû le ber êşî didan
Wa dezanin rûmetîm em şew le xew da gestuwe

Taqet û sebrim eger rûyîn tenî efirasîyab
Rostemî hîcrî le erzî dawe destî bestuwe

Ey seba yarim eger pirsî le hallim pêy billê:
Mabû ta ew weqte hatim wa dezanim mirduwe

Xem mexo qurban le bo qurbanî ‘îdî weslî to
Muddeyêk e bew umêde Hacî xoy dabestuwe!!

Qîssey şebî hîcranî

Qîssey şebî hîcranî meke basî sibeyn e
Lew şamewe ta subhî dûsed fersexî beyn e

Mewrûsî tu we xullqî hesen, husnî xelayiq
Çunkî ke musexxer bikirên herdû huseyn e

Qanûnî şîfabexşî nîgahit be îşarat
Celladî rimûzî kutubî hîkmetî ‘eyn e

Zahir meke dellakî be Mûsay yedî beyzat
Bo xettî yehûdî ke şerrî Bedir û Huneyn e

Ta sade bû canî nedewîst îstêke le’lî
Dû şahîdî mestî xetî hênawe ke benî ye

Dill germ e be dewrî qemerî gerdişî çerxî
Xurşîdî zemane ke hemû mûcîbî beyn e

Yar hatewe fermûy xetim hênawe be sewqat
Pêm gut: Eger em tuhfeye bo Hacî ye meyne

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le ser şew rojî danawe

Le ser şew rojî danawe, mellên fêsî le ser nawe
Le ber ba camî yaqûtî be mîşkî wişkî dadawe

Le damênî çîya bo xermenî gull xêwetî xara
Be dû estûndekey zîwîn tenafî zullfî helldawe

Le berqîy rengî şerwallî heya damênî hellmallî
Le teqqey dengî xillxallî le gerdûn zuhre damawe

Le teqqey nall û şeqqey panî berzî asman lerzî
Teq û toq kewte ser erzî, dellêy mehşer hellstawe

Le nawey hellgerrawey zullfî xallî reş temaşa ken
Bo teyrî dill bî'eynîhî dellêy em dane ew dawe

Be sed xûnî ciger fêrî nîyaz û naz û 'îşwem kird
Ke çî êstake demgatê dellê sa la ço bew lawe

Le teswîrî qellem mûy kewte ber dem nuqtekî danat
Ewî kirde kemer neqqaş emî bo zarî danawe

Derî to Ke'be bû Hacî tewafî kird û neyzanî
Çi qewma Ke'beke çi bû, Mescîdul'eqsa ye rûxawe!

Be rux û zullfî şew û rojî

Be rux û zullfî şew û roj î heta roj û şew e
Girpey dem be demim dujminî xûnînî xew e

Fîtney xemzew û nazî nîgeh û çaw e ke wa
Hat û hawar û hera û gêçell û tallan û rew e

Dill le fîkrî dehenit halîkî rêgey ʻedem e
Ya muqîmî serî zullfî tu we ya rahrew e

Le gell em ahuwe dê em segî rîş kon û niwê
Dête so dêtewe sû rêşî ke kewne cidewe

Le behay mujdey wesllî qedemî çit bidemê
Dill enîsî serî koy dulber e canîş girew e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le dewrî xallekey kullmî

Le dewrî xallekey kullmî kemarî zullfî danawe
Le ser teswîrekey Adem melek sed ‘uzrî hênawe

Şewî mî’racî subhane beqeddî seruy toy zanî
Le sîdre Cubreîl boyê le nîwey rêge lay dawe

Ke şeytan taqî mîhrabî biroy toy dî gutî: Ya reb
Le secdey hezretî Adem serî xom boçî badawe!

Bellam ey wişke şêxanî zemane pêm billên axir
Le ber çî perçemî saqî le subhî cebhe toraw e

Be xeyrez basî ew zare muhîmm e derkî ewzar e
Ewî bîstûme bîstûme, ewî dîtûme damnawe

Çi seyyadêk e seyyadî buwe seyyadî ustadî
Çi hestî kirduwe hesta çi bazî best û westa we

Were reb’î dill û çawim beheştî rub’î meskun e
Heta dill hez deka bax e heta çaw birr deka aw e

Nîhayet bimkujin wella le maçî lêwî xoş nabim
Ewî Xuwa hez neka nabê, ewî qewmawe qewmawe

Le heqqî meqdemî Hacî qurrî kiwê kem be ser xoma
Dillêkim bû le dinya da ewîş beynêk e tora we

Le dû la ejdîhay zullfî

Le dû la ejdîhay zullfî le gencî husnî allawe
Le layek ‘aqllim emma le ew lawe teme’ xaw e

Le bo merdum weha çak e ke mallî xoy le ber çaw bê
Weku çawim le dinya da eger mehsûlî her aw e

Le jûrî awî Mûsa ye, le xwarî agirî Tûr e
‘Ecayib xettî Fîr’ewnî nexinkawe û nesûtawe

Eger çawim le durr barî ne ‘eynî ma ne asarî
Le dînî nakewê çunke nîşaney xallî her mawe

Emêstê mûrî xettî maç be wechî tuhfe ger bênê
Eger laqî kuley pê da Suleyman xatemî dawe

Be ser rûma deyê tabûrî eşkim bo mededkarî
Ke dîtim qel’ey husnit supay xet mehserey dawe

Yeqîn murxî dillim Hacî le dawî zullfî dernaçê
Heta em xalle muşkîne mekanî ‘enberî xaw e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qeseyêkim heye

Qiseyêkim heye deykem mellê bêtecrebe ye
Ba wicûdî ewî nadane le lay wek geme ye

Muqtezay ab û heway xakî dîyarî Rom e
Ehlî sûtawî me ye, bestey awazî ne ye

Hakimî rêgirî me'mûre ye, qazîy dizî roj
Wizera û wikelay gurg e, re'iyyet gele ye

Sallêkî rîx e eger şêx e eger mêx e, le wê
Şêxe her kamê neda ta demirê her dede ye

Zanî û şarîb û lotî degirin; walî dellê:
Berî den parey xoy daye, çi 'eybêkî heye

Hênde bêgane le îslam in û ehbabî fereng
Mutteqî dêw e le layan, muteşerrî' şewe ye

Zullmiyan 'am e le ser 'amme, re'iyyet fewta.
To meke men'î 'ewamîl, ke xetay gay bine ye

Her leşa ta begeda tûşî yekêkî nabî
Lêy bipirsî be heqîqet billê: Ceddim eme ye

Lazim e em xezele le wek xezellî bîkene ber
Her weku Hacî eger şar e, weger dîhkede ye

Le nezaket kemerî

Le nezaket kemerî wek xetî ehlî hîkem e
Le nebûn da dehenî bê qise ‘eynî ‘edem e

Çîn yekêk e le keçî zullfî ke çî aciz e, bo?
Dillî sewdayî xetay kirduwe bo ye nedem e

Maçî ew xunçe deme bê heqî can muhrî dem e
Sallêkî rahî ‘edem bê demî neqşî qedem e

Ger reza bê çî ye bo maçî demî canî ‘ezîz
Tecrubem kirduwe ‘îşret be dem e nek be dem e

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pîtî ê

Aftabî husnî to

Aftabî husnî to roj e ke dê û awa debê
Qametîşit wek hîlalî yekşew e awa debê

Kame dana mêzerî dana û fêsî kirde ser
Bêheyar û serpel û serxoş û bêperwa debê

Padşahêkim heye ger min bikate dergewan
Hacîb û xeddamî min Eskender û Dara debê

Dawî nawe zullfî dûlane le herdû lamewe
Dill giriftar e eger lem la nebê lew la debê

Şew le bezmî dulberim bem te'ne wa sûtandimî
Çawî da perwane fermûy 'aşîqî her wa debê

Wasîfî qeddî eto xamey debête ney şeker
Elfî qeddî musteqîmî qafîyeyî balla debê

Ser sipî û dill reş bû Hacî ta feqê bû, êstekeş
Rûreşêk e rîşsipî, Xuwa 'alîm e her wa debê

Êmeş demirîn

Êmeş demirîn debîne xakî sere rê
Em roj û şewe tenûrî subhî degirrê

Desga û dukanî şarekan dadenrê
Emyan defiroşêt û ewî tir dekirrê

Em bawkî mirduwe yexeyî dadedirrê
Ew bûkî nûy heye ke way bo debirrê

Bê bist e felek aşekî way nawetewe
Bo harrdinî ême çi ‘ecayib degerrê!

Ladêyîy’ş rezî aw dedat û werdî debirrê
Heywane dezê, seg dewerrê, ker dezerrê

Luqman leme da şuwan e ger xoy bikujê
Gawan e Filatûn le xema ger bidirrê

Em deste ke çû desteyekî taze ye dê
Me’lûm nebû em keşmekeşe key debirrê

‘Alem hemû mirdin le xemî zanînî
Em hîkmeteyan nezanî hîç lêy megerrê

Lem lawe heta Hacî neçête ew la
Mumkîn nîye tê biga le we, ger bifirrê!

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Metnî kutubî em dere

Metnî kutûbî em duwe ba şerhî kirabê
Îşkalî rimûzî meseley Qazî mabê

Qazî herro sînet superî tîrî qeza bê
Wek dînî rewafîz bedenit bê serûpa bê

Xot hakimî em mes'eleye key debê wa bê
Pîrî weku to mahî hebê û makerî gabê

Bê mirwetê bem mirwete qet mirwetî nabê
Sed def'e kerîş herweku to mirwetî gabê

Hacî dellê em mîsre'e te'rîxî ye Qazî
Însafî nîye, 'arî çî ye, mirwetî gabê!

Ey Suleymanî zeman

Ey Suleymanî zeman û şeyxulîslamî enam
Qasîdî rêgey hîdayet hudhudî dana debê

Min humam û qulley qafî qena'et cêgem e
Layiqî peyxamî ew perwîzeye 'enqa debê

Bo hizûrî qadirî bo çî denêrî makyan
Makyan emrî le ser şahîn le kiwê îcra debê

Wextî peyxamit xurûsêkî hezar poyem hebû
Daye ber şeq qasîdê wa bêcewabî wa debê

Ta hellênê zaxî şeb tawusî hêlkey subihdem
Mezre'ey çerxîş le tuxmî necmî ta awa debê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dellên yar dêtewe

Dellên yar dêtewe babî mehebbet, ya Xuda wa bê
Eger duşmin dellê: Nabê! Muxennî to billê: Nabê

Delerzê baxeban serut le tirsî qametî berzî
Gutî em nîkte barêkî giran e tê degey nabê

Le hîcrit herdem e seylî siruşkim maceray çawim
Be rengêk rengî kird rengî cîhan bawerr meke wa bê

Le nakaw dilberim fermûy helliste êstekê wa`îz
Le boman dadeda we'zê; gutim: Bakit çî ye ba bê

Be tedmîn ferdekî Nalîy dehênim ta refîqanim
Bizanin feriqman zor e, xezef qet wek guher nabê

"Kemendî zullfî dûlan e, le bo gebir û musullman e
Dekêşê bê muhabane, çi lem la bê, çi lew la bê"

Ger xellqî cîhan

Ger xellqî cîhan yeksere feryadresim bê
Wellahî mepundar be xeyrî to kesim bê

Wa sozî dillim agirî berdawete cerigim
Toqîwe henaseş nefesêk hem nefesim bê

Murxî seherim ball û perrî wehşetî rêgey
Hestan û firrînim yek e çerxîş qefesim bê

Nadem be hemû mullkî Suleymanî zemane,
Lem ‘aleme rûtî çî ye her ga hewesim bê

Her şew be dizî nexme le ser sîdre dekêşim
Ba sabît û seyyarey gerdûn ‘esesim bê

Hacî ke nîgarim seferî kird û nemirdim
‘Eybim meke wek hatuwe em şerme besim bê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Daxî kirdim be cefa

Daxî kirdim be cefa la le ruxê zîbayê
Pîrî kirdim be sitem la mezebê tersayê

Tîjîn weqtî sitem, gahî kerem bê beserê
Le wefa hîç nezanê le cefa danayê

Yarî exyar û be xoy mu'mîn û kafir sîfetê
Xizmî duşmin rewuş û qatîlî bê perwayê

Namusullman, senemê, xûnî musullman rêjê
Serkeş û bedxû û hem dilşiken û xudarrayê

Qîssey halletî ew keşfe le rom û 'ecema
Nîye wek Hacî bêçar e ebed rîswayê

Wa dîyar e..

Wa dîyar e resim û qanûnêkî dewran dadenê
Kurdî ême gerdişî germên û kiwêstan dadenê

Ey emîrî kurdekan bo êwe ‘eyb e û şûreyî
Hîzekî wek……..... dadenê

Bo ke ye namûs û ‘ar û bo çî ye îman û dîn
Xaç û Încîlî le cêy tefsîr û Quran dadenê

Herke tacî naye textî le Kurdistan dadenê
Xerc û pîtakî le ser goran û soran dadenê

Medrese deykate cêy qîssîs û rehban û keşîş
Bang e naqûsî, le tekyeş pîrî metran dadenê

Bo îhanet kamî sahêb ‘îzzet e ‘ezlî deka
Bo rezîlî cûtyarî xoy û gawan dadenê

Hem le cêy begzadekan û cêy fillan îbnî fillan
Bo rîyaset ser be ser elqabî... dadenê

Her le paş çend sallî tir tesxîrî Bexdadîş deka
Şarezûrî qişlle ye, debbo le Baban dadenê

Bax û raxî bilbile deykate cêy zax û zexen
Gurg û mam rêwî le bêşe û lanî şêran dadenê

Xanetan wêran deka qesr û qusûrî lê deka
Bo emey neçine ‘ecem êlçî le Taran dadenê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bo kurrî çak û kiçî şîrînî raykêşê be zor
Kullî şar û dîhkede casûsî penhan dadenê

Ta bizanê kê niwêjî kird û rojî girtuwe
Bo sîyasetkirdinî penca nîgehban dadenê

Ta weha bêîttîfaqî û serkeşî bê şêwetan
Tacî kîbr û nîxwet û xîret le sertan dadenê

Şarezay ehwallman e... bêgane nîn
Daxî sed sallî heye emrro le kurdan dadenê

Xizme besî ye, tê bigen her baye qewlî...
Şahî Êran radeka sulltanî tûran dadenê

Îste me'lûm bû.....
Zahîren her kamîyan ta'et deka, nan dadenê

Rêgir û hîz û diz e, jin hellgir û mallanbirr e
Faîdey çî nêwî kunyey xoy musullman dadenê

Wa dezanê qewmî xoy wek daye ber şîr û tifeng
Qesrî dîn awa deka, bunyadî îman dadenê

'Eqllekî Xuwa dawye ger pîrejin serfî bika
Destî Rustem badeda, tûran le Êran dadenê

Îstekê eyyamek e her mîlletê hîmmet bika
Mûrî bêmaye le ser textî Suleyman dadenê

Beytî Hacî çunke efsaney turkbazî nîye
Zor werrîn e, ba wicûdî durr û mercan dadenê

Saîlêkî mekkeyî dêt û be mektûbî diro
Hîşmetêk peyda deka, mallî firawan dadenê

Gewre deyxwênêtewe, hem biçke deynûsêtewe
Beytekanî min le goşey taqî nîşîyan dadenê

Bîstûsê beyt e qesîdem her kesê giwêy lê bika
Pê le ser taqî meh û eywanî keywan dadenê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hebîbî can

Hebîbî can le ser çî em riq û kîne, heta key bê
Bifermû dengî saz û nexmey mutrîb, neway ney bê

Berî bû dill le ʻalem ta le nêw zullfit muqeyyed bê
Îtir ferşî heyat û xoşî yekbare deba tey bê

Be badim da dill û dîn ʻaybet bo badey çawit
Demêke tuşney hîcrim, billên bade peyayeyî bê

Le nez'î derdî fîrqet canî zarim qet xelas nabê
Meger lem kewserî lêwe, billê bo xeste bameyî bê

Le ber sêwî cemalit heq nîye tenha min im mehrûm
Yekê leymûn û yek narinc e, bo Hacî meger bey bê

Pîtî î

Ey bê nezîr û hemta

Ey bê nezîr û hemta her to yî ke berqerar î
Bê dar û bê dîyar î, bêdar û payedar î

Bo baxî merdî baxî sermayekey xezan î
Bo mezre'ey feqîran sermayekey behar î

To padişa nîşan î bo her sewadî e'ezem
Bê sedir û şanişîn î, bê perde perdedar î

Xellaqî bêfitûr î, sulltanî bêqisûr î
Rezzaqî mar û mûr î, awdêrî dêmekar î

Feyroze textî gerdûn mesnû'î neqşî to ye
Yaqût û le'lî roj e, estêrekan derarî

Cê û mekanî to ye bê cê û bê mekan î
Leyl û neharî to ye bê leyl û bê nehar î

Her emrî to medar e bo karûbarî 'alem
Herçendî bê wezîr û bê sedir û karubarî

Sehranewerdî şewqit xurşîd û mahî taban
Dû cariyen şew û roj bê mehmel û 'emar î

Me'lûm e boçî Hacî medhit deka be kurdî
Ta kes nellê: Be kurdî nekirawe medhî barî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Asmanî bêstûn

Asmanî bêstûn wek xusrewî mîhrî hellat
Hîndî şew têk çû, şika wek mûy zengî leşkirî

Îttîfaqen îttîfaqim bû le gell Nalî weku
Tacir û gewher le gell gewherfiroş û muşterî

Çend xezel bûn taze baftî kargahî muşterî
Tacîr û gewher meta' û şamî xurbet tacîrî

Yek yekî hênaye der, gerdî kesadî lê tekand
Daye min fermûy dirêxa kes nîye sewdagerî

Dest be destî xistim û hem daye ber ba mecme'im
Asefî min bay le cem'î to ke Hacî Qadirî

Eger kurdêk qisey babî nezanî

Eger kurdêk qisey babî nezanî
Muheqqeq dakî hîz e, babî zanî

Were ba bot bikem basî nîhanî
Tefennun xoş e ger çakî bizanî

Selaheddîn û Nûreddînî kurdî
'Ezîzanî Cizîr û Mûş û wanî

Muhelhel, Erdeşêr û Deysemî Şêr
Qubad û Baz û mîrî erdelanî

Emane pakyan kurd in, nîhayet
Le ber bêdefterî win bûn û fanî

Kitêb û defter û te'rîx û kaxez
Be kurdî ger binûsraye zubanî

Mela û şêx û mîr û padişaman
Heta mehşer dema naw û nîşanî

Be zîddî mîr û paşaman birawe
Bes e ba bêyne ser rêy mîhrebanî

Ke deygut şêxî min: Min destgîr im
Le lam wa bû le ber cehl û ciwanî

Ke pîr bûm tê geyiştim destî girtim
Le kesb û kar û tehsîlî me'anî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bellê şêx qutb e emma qutbî aş e
Be aw û nî'metî xellq e gerranî

Le bo jin dê le kollan wek segî har
Le jin helldê be mîslî ker le xanî

Billê bew serkizolley kuzperiste
Be çawî kildiraw û rîşî panî

Ke nef'êkit nebê bo dîn û dewllet
Be min çî neqşbendî ya nemanî

Kesê pîyaw e ke danê wek Hem Axa
Le bo ebnay cînsî nan û xwanî

We yaxud wek Emîn Axa be hîmmet
Bika bo qesrî mîllet pasebanî

Billê lem behse her kes munkîrî to n
Bifermû sehl e rêgey îmitîhanî

Be ummêdî dû sê dana ye Hacî
Durrî giran deda be herzanî

Perêşan zullfî tatarî

Perêşan zullfî tatarî mîsalî ejdîhay ceng î
Nezîrî seruy kişmîrîyî, qîyamet qametî şeng î

Le şewqî şem'î ruxsar î, le bîmî te'nî exyar î
Le kulbey sîney narî desûtê dill be bêdengî

Le ew lay kes qutar nabê çi mu'mîn bê çi kafir bê
Le em laş kes xelas nabê le hînd û deylem û zengî

Temaşam kirduwe neqşî derahîm serfî memnû' e
Ke çî qazî îzafey kird be miftî hate ber çengî

Dû marî zullfî şebrengî ke bê bo le'lî zehhakî
Le tirsan pêy deda Hacî Fereydûn textî xoşengî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Sofî be ser û rîşî

Sofî be ser û rîşî, bem xerqey ser doşî
Çend çêllegel û biznegel û mêgelî doşî

Fermanî ke da kuştimî celladî nîgahî
Xûnî minî bêçare ‘edu û noşî be xoşî

Lew we’de reqîbim gutî: Bê ‘ehd û wefa ye
Me’lûm nebû lem ‘aleme da rast û diroşî

Teşxîsî dewakem meke ey Bu ‘Elî Sîna,
Lew çawe ke bom bû be şîfay ‘eynî nexoşî

Ew çawe weku mes’eley kuhle sewadî
Şaz e weku nergis nîye bê fezlî biroşî

Muş’îr be wefatî minî mîskînî feqîr e
Wa rût e le xet bergî sîyay matemî poşî

Hacî le tewafî hecerul’eswedî xallî
Giryan e sefabexşî ne wek se’î û xiroşî

Bem nehiwe ye serfî îşqbazî

Bem nehwe ye serfî ‘îşqbazî
Musteqbelî kemtir e le mazî

Ye’nî le me da ke bîkuje zû
Bêferq e heqîqet û mecazî

Em şî’re zerîfe xette çak e
Nûsîwmetewe le rûy beyazî

Keşşafî rimûzî ayetî to
Tefsîrî kebîrî Fexrî Razî

Bo qeddî zirawî bêjrawe!
Nêze û ‘elem û mesafe xazî

Neydawete min Xuda be miftî
Bem meşrebe xot meke be qazî

Em qafîye şayegan e emma
‘Eybî nîye cahîlî be razî

Ew rizqî muqerrerr e be xoy dê
Sed def’e bixwazî ya nexwazî

Qîrtasî û şehrrewa ye Hacî
Neqdîney to, be çî denazî!

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ta salîkî mesalîkî

Ta salîkî mesalîkî mullkî qena'etî
Bakit nebê le rêgir û ehlî şeqawetî

Sofî 'îbadetî hemû bo mekr û rîwe ye
Ger şêrî nerr be giwê bigrê, peşm e ta'etî

Îxlas e eslî meqsed û xorra şeqî debê
Wa tê dega be ser mequlat e se'adetî

Bême'rîfet mebe le terîqî heqîqeta
Ser menzîlî şerî'et e cêgey selametî

Nagen be hîz û rêgirî ême le mullkî Rom
'Ellamey wîlayet û şêxî wîlayetî

Mefhûmî dû hedîsî sehîhim le beyteka
Cê kirdewe; nezer bike kurdî û fesahetî

Dunya segî le oxlleme toqîwe talîbî,
Neymawe herweku segî pêsûtû rahetî

Sed qubbey xewrineq û seddî skenderî
Nagate beyte kawilî Nalî û metanetî

Saqî kerîm e badey bezmî eleste ye
Hacî le camî qelbî şikawe şîkayetî

Ke hesta qametî berzî

Ke hesta qametî berzî le ferqî ta weku erzî
Perêşan zullfî sed terzî be yek da darrja û lerzî

Le dewrî tabeta westa le teşbîhî dillî westa,
Mu'ttel bû gutî: Êsta le çîn û pêçiş û terzî

Seday ya heyyu î derwêşan le tirsî zullfî pirrçînî
Le 'Îsa 'ersey gerdûn be teng hat herweku derzî

Le sewday zullfî pirrçînî le nêw çînî numayan bû
Xeta û çîn û xuten yekse giriftar bûn le jêr qerzî

Hellîda zullfî çewganî kurey xurşîdî da ber şeq
Ke dayda çî melayîk bû le gerdûn hate ser erzî

Heyayî çû çetrî tawus baregahî şe'şe'ey xurşîd
Kemindî pîleten, zincîrî Dawid, gurzî goderzî

Deqîqek bê serî mûyek le zullfî wergerrê mewda
Le gell subhî qîyamet da deka bê teqye serberzî

Mirîdan mest û serxoşin leneşey badekey destî
Melayîk cumle bê xoşin benazî çawî pirr remzî

Miradî min mirîdî xalîs e xeyyatî ye karî
Melayîk sûret e, ah û nîgah e, Hacî ye terzî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le ser tenafî ke lerzî

Le ser tenafî ke lerzî hetîwî sindûsî
Şika meta'î zerîfî û qîmetî lûsî

Tenafî pirdî sîrat e munaziran mehşur,
Mekanî meľeb e heşr e le mu'mîn û rûsî

Sema ye 'ersey bazîy gurîsî kahkeşan
Star e nazîr û mahîş hîlalî me'kûşî

Şu'a'î şe'şe'î şem' e meş'elî mahî
Le şermî tell'etî ew şew debête casûsî

Munasebey ew û Leyla, mîsalî dêw û perî
Muşabehey ew û 'Ezra, xezal û casûsî

Dû çawî 'eynî nexoşî le nêw serî zullfî
Giran û sûk e le tirsî reqîbî kabûsî

Le kuncî xaneqe sofî xiza û neyzanî
Tema'î dînî nebê ya emanî namûsî

Wa heşr e sofî bifermû heta le dunya da
Sîyahrûy û xellq bizanê salûsî

'Uyûnî tenqetî'u mîn nî'metî llahî
Adîqnî dem'î îla ma tublî melbûsî

We 'eynî 'ade lîtebkî fema stetale lena
'Ela fîraqî men ehwa yekunu mey'ûsî

Fîday lengerî destî Sînanî Keykarûs
Direfşî Kawe, rimî Gîw û nêzey Tûsî

Ke hat û kewte sema ‘îsewî şika û nema
Helahelay killêsa, seday naqûsî

Ke hate xende û fermûy: Yellancî maşella
Be sadîqî buwe ‘îsayî mîlletî Mûsî

Heçî ke hate temaşa be nûkî mujganî
Fe ha’ula’î ‘ebîdî le ser dillî nûsî

Be wesfî qetre be derya ye şa’irî weku min
Eger be qafîye danêm luxatî qamûsî

Le qafîye şu’era ‘eyb e la biden emma
Be yadî çawî emin la dedem be mexsûsî

Cebînî mah û, ruxî mîhr e, zullfî şew, dehenî
Şebeb be qafîyetengî bû Hacî neynûsî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Sed weku Rostem

Sed weku Rostem be dill qemçî le rexşî da, bezî
Wek geyişte xendekî payanî ‘umrî dabezî

Rojit e ey badî newrozî le bin befrî giran
Kanî pêy sirr bû, çinarîş destî çû, pençey tezî

Sunbulî zullf û gullî ruxsar û seruy qametî
Mangî nîsan û gullan neydî le nêw bax û rezî

Dulberim tenha ke bû lew beyne xoy rût kirdewe
Min dillim xoş bû ke çî dûbare daypoşî kezî

Xemze destî kirde naz û marî zullfî daxizî
Dill le ber pêy kewtibû, em deydizî ew deygezî

Çakî sînem bo çî ew xeyyate naydirwêtewe
Çawî bîmarî wicûdî kirdime derzî û dezî

Hacîb û Hacî hemû rojê be gij yek da deçûn
Bêheya bû ew sege ‘arî nebû,. Hacî bezî

Hemû ‘umrim

Hemû ‘umrim le rêy hatûnehatî
Be ser çû ey ecel her to nehatî

Le destî hacîbit çawim xulamit
Beratî qebr e, peykan e xellatî

Berux ferz e xubarî summî espit
Bimallim şahî pîl efgen be matî

Le tawî xusrewî seyyare encum
Hellatin, yarî min to hellnehatî

Le rehnî wî debê sofî weku min
Bika pêşkeş hemû sewm û selatî

Dezanim rehmetul ‘alemînî
Le bedbextî min e kemîltîfatî

Çi gencêk e îlahî gencî husnit
Le hîç dînê nebû wacîb zekatî

Le tûşîy xom bû herçî tûşî xom bû
Le destî xoyetî Hacî şikatî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Neqqaşî demî

Neqqaşî demî nuqtekî dana be nîşanî
Zanî ke zemî kirduwe bêzar e le manî

Wesfî kemert xeyrî demî to nîye bîkat
Bê nuqte billê ew xetî me'dûm e beyanî

Sûretgerî ser lewhey dîwanî melahet
Dû Yusifî kêşawe be bê ewwel û sanî

Ferqêkî nebû xayetî ew kirdîye sûkî
Zû hat û eto ba'îsî nazit be giranî

Pêm xoş e xezel ferşî qudûmî 'uqela bê
Nek bîn û le ber ken cuhela lefz û me'anî

Îmkanî le kin ew 'ulemay mû deqellêşin
'Enqa û wefa bû çi mîyanî çi dehanî

Ta destî neda xencerî neyferû: desa dey
Hacî bikujin xêr e îtir meyden emanî

Meh û mîhrî be xaret da

Meh û mîhrî be xaret da be şu'ley şem'î ruxsarî
Gullstanîş be yexma çû le tengîy xunçey zarî

Le neş'ey dîdey mestî hemû meyxane wêzan in
Hemû kes beste zunnar e le sewday zullfî tatarî

Rewan perwaney nar e, minîş wek çawî bîmar im
Zemanim wek şewî tar e, dila wek xunçe xun xwarî

Dill û can û rewan û ten weku îman û dînî min
Fîdayî ruxsarî gullnarî, nîsarî zullfî terrarî

Dexîl ey çawî cadûger bifermû merduman yekser
Dellên xewtûy bêdar î, dellên mexmûrî huşîyar î

Şu'a' û şe'şe'ey mîhr î, eşî"e û mîş'elî bedr î
Le sayey pirr tewî rût e be qurban nûr î ya nar î

Bipirse Hacî to carê le zullf û perçemî xwarî
Billê: Ger tarî yî boç mar î? Billê: Ger mar î boç tarî yî?

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le ‘eynî le’lî kanî

Le ‘eynî le’lî kanî xettî sebzî bû be mîwanî
Nenazê ba xidir îtir ke meşhûr e be heywanî

Heta kuhlî xubarî pêy nekate çawî xoy merdum
Sewadî xwêndinewey nabê şikstey xettî reyhanî

Ke hat û kewte hellqey gêjî Miryem ew deme yekser
Erestoş wek Filatûn tûn be tûn çû kewte heyranî

Eger em zullfe muşkîne, weger em le’le rengîne
Dellêy sehray maçîn e, dellêy kanî bedexşanî

Bixwêne kafîye û şafê kemalî neş’ey camî
Sedî wekî to hacîb serfî ‘umrî kird le derbanî

Be cê ma Nalî wek nallî, be paş kewt kurdî wek gerdî
Ke Hacî xarî da espî le meydanî suxendanî

Pîtî k

Ta billêy ferqî heye

Ta billêy ferqî heye mîhrî min û mahî felek
Le sera ta be sureyya, le sema ta be semek

Her ke lay kirdewe ‘uqdey serî zullfî la da
Le hemû lawe seday sellî ‘ela geyîye melek

Giwê le wa’îz meke emşew tek û tenha were lam
Rojî mehşer be me ger bimxene dozex be derek

Kutkut û tîkebetîkem biken û bimdene seg
Cêgem e lem dere narrom be cinêw û be kutek

Xalîs e sîkkey îxlasî dillî muxlîsî min
Bîxe nêw bote çi hacet be me bîdey le mehek

Ey mehî çarde seyrî mehî dû hefte bike
Wek minî dabinê çawî min û to nagene yek

Lenqûşî xezelim çî n û xeta damaw in
Kê dellê emtî’yey kurd e kellaş û kepenek?!

Bo temaşay belek û zendî spî û çawî bellek
Nîştuwe lem dere ‘aşiq weku hacîleklek

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le gawan û şiwanî kurdekan yek

Le gawan û şiwanî kurdekan yek
Bes e bo leşkirî sed kerre dû lek

Fîday cutyartan bê Hatemî Tey
Be qurbanî sepantan alî Bermek

Mirîşkî êwe seyyadî şehên e
Le kin ‘enqa firrûce hacîleklek

Şiwanî mêgelî kurdan le şerr da
Weku qessab e, duşmin mêgelî şek

Le ber hîzebixoyî û natebayî
Le jêrî hîzî hîzan bûyne doşek

Heta wek agirî bin ka n le gell yek
Eger tofan bê leşkirtan be pûşek

Le giwêy ga nustûn boyêke rêwî
Le ser êwe weha şêrgîr e wek seg

Selahî êwe êstake sîlah e
Tema’î gewrey bêçek neken nek

Kirawe întîcabî wişke sufî
Le dîwanî kerî bê nuqtey şek

Pîtî m

Cîhan bûyte cezîre

Cîhan bûyte cezîrey behrî giryem
Be bê buhtan eto Zîn û emin Mem

Le cînsî ademî wek to nezawe
Perî rûyek le Adem ta be xatem

Emin şêx im, serim şax e, henasem
Nesîm e, dîdekanî mêzerim tem

Dellên me'şûq e dête ser serînim
Dezanim wa nîye wellahu e'lem

Lebî Zehhakî fermûy marî zullfim
Cemî kelley keye, mûçey serî cem

Mellê kezzab e sofî, sax e wa'îz
Le lay min wek yek in bê keyf û bê kem

Murîdî sadiq û şêxî keramet
Herîsî qanî' e û 'uşşaqî bêxem

Sewadî e'zemî Qunstentenîyye
Gelê bênawî kirde sedrî e'zem

Be destûr û be qanûn û nîzamî
Xuda way kird ke sûrî kird be matem

Kurranî dû hewê n dinya û 'uqba
Mîsalî dakyan in ew le gell em

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Be yek naçin Reqîb û Hacî Qadir
Xudaya ew rezîl ke û em mukerrem

Weha meşxûllî to ye

Weha meşxûllî to ye cîsm û canim
Be rohkêşanî xom zehmet bizanim

Reqîb û seg çi lazim ta emin hem
Be rojê dergewan, şew pasewan im

Mîsalî ronî zeyt û mêwî şane
Gellî zahîr bû sûtanî nîhanim

Perêşanî dill û cem'î reqîb e
Le sewday zullfî to sûd û ziyanim

Billên: Qadir; delçêm: Naw Hebîb e
Be zîkrî êwe wa fêr e zubanim

Ewî şa'îr nebê kore wicaxî
Le sayey şî'rekan babî kurran im

Mellên: Bê kare bû Hacî le Roma
Emin piyaw im le nêw şarî jinan im

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Wekû roj û şew e

Weku roj û şew e ferqî gudazî şem' û sûtanim
Ke ew her şew desûtê, min hemû dem; gerçî însan im

Be texmîn wesfî fîrdews û cehennem boç deka wa'îz
Le sayey wesill û hîcranit be xom dîtûme deyzanim

Le sîrrî hîkmetî çawit geyiştim ba'îsî rûhe
Tebessum mawe tê nagem le fehmî remzî heyranim

Kizey cergim dexîlit bim fîraqim kird ewa mirdim
Desa dey bêre lam satê nemawe tabî hîcranim

Ebû zeydey deka rohim le gell maçî demit emma
Detirsêm wek nîşanim da billê: Hîç e û peşîman im

Ke dûnê hatî fermût bê û nehatim mesllehet wa bû
Ewêste çawekey min çî defermûy bende ferman im

Eger Bexda şika seddî nema darî le ser berdî
Le Decley nagirin Hacî dîyar e coşî giryanim

Be şestî zullf û rûy mahî

Be şestî zullf û rûy mahî weku mahî giriftar im
Gehê dillgestey mar im, gehê gîyan xestey nar im

Segî dergat û mecnûn û nicûmî asman yekser
Meger her xot bizanî çon gewah in min ke bêdar im

Be yadî nexlî ballat aw le çawma bê qisûr herdem
Decoşê, xayetî dûrim, dezanî min wefadar im

Le behr û bêşe û sehra, neheng û zeyxem û rûba
Weku seg helldeyên êsta le ah û nalley zarim

Emîş caran nîye qurban tufeylî bême ser xwanit
Xetit mîhmanî ye emsall nemawe lezzetî parim

Be giryanî rîya wa'îz be serma hat û neyzanî
Kewa min aşnam nagate qapîm mestî huşyar im

Êraqî bê ewan, meşreb muxalîf, wek seba heste
Meqamî rastî Hacî Hîcaz e ger deçê yarim

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dûsed gunahî heye

Dûsed gunahî heye xellq ba wicûdî kerîm
Emî ke dawye deyda, çi razîqêke, kerîm!

Mepirse derdî xerîbî û lezzetî wetenim
Ewî le destî degiryam emêste boy degirîm

Sewadî sêberî toyan heta nekirde mîdad
Nenûsra wereqî emrî kun fe kane-yî qedîm

Le lay me'arîcî to telixraf û berq û şîhab
Nezîrî rewtî tenaf baze fîkrî teb'î 'eqîm

Cudayî basî meke fesllî qabeqewseynit
Kemanî ebrûy to bû le bezmî xasî 'elîm

Xellatî 'îzzetî lewlake û tacî erselnke
Bes e senay celal û kemalî xullqî 'ezîm

Xulase nêwî nibuwet le paş rîsaletî to
Mîsalî margezîydey muleqqebe be selîm

Be ber şefa'etî xotî eger nexey Hacî
Lîbasî ke'be le ber ka debê biçête cehîm

Pîtî n

Em seganey

Em seganey ke le lay ême wezîr û wikela n
Bêne lay to be Xuda naykeye gawan û şiwan

Eme kermîz e dellên warîşî şer'î nebewî n
Hemû 'ebdî senem in, basî meke gewrekeyan

Her edîbêk buwe sa Xuwa le demî nawe billê:
Dewlletî dawe be ker, nî'metî dawe be segan

Her kesêkî kes e, nakes nîye, herfêkî bes e
Were ser basî xet û xallî hetîwî xoman

Ey fîday xakî derit tacî Key û mesindey cem
Wey be qurbanî ser û fêsî keçit tacî keyan

Xom be Dara û Eskender û Xusrew nadem
Ger bizanim le ber em dergeye debime segewan

'Aşiqanî to hemû tîrî nîgahêkî bes e
Were derganekeman damînî tom bimke nîşan

Be umêdî eserî husnî reza deçine willat
Şî'rekanim ke serapa weku xom bê serûpan

Nalî û xakî Bebe, Hacî û Koye be mesel
'Eynî hî Hafiz û Şîraz e Kelîm û Hemedan

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xakî Cizîr û Botan

Xakî Cizîr û Botan, ye'nî willatî kurdan
Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan

Wa rêgetan debesrê 'êlatî Caf û Billbas
Ger mirdûn le germên memnû' e biçine kwêstan

Kamî kiç û hetîwî şîrîn bê raydekêşin
Hawar debene ber kê peşme dexîl û aman

Mescîd debête dêre naqûsyan mu'ezzîn
Metran debête qazî, muftî debête rehban

Hîç xîretêk nemawe sed car qesem be Qur'an
Peyda bê Ermenistan namênê yek le kurdan

Sertan le qurr hellênin, ehwallman bibînin
Çon în le destî zullmî bêdînî dûr le îman

Wellahî summe billa, tellahî em bella ye
Her hêndey pê dezanin îqlîmî kirde tofan

Tofanî aw nîye hîç derçê le kêwî Cûdî
Behrî tifeng û top e, însan e behrî 'Umman

Em qîsseyey ke kirdim nagate çend sallî tir
Em hallete debînin yek yek be çawî xotan

Hall êstêke weha ye meger Xuda be sûkî
Têkyan bida we îlla dûr e le 'eqillî însan

Herçî weku beyanim bo kirdûn be tehqîq
Peyda debin segane, kam qurr bikeyn be serman

Lem beyne îttîfaqê peyda biken be merdî
Ferqî nebê şiwan û cutyar û mîr û gawan

Ger hîç nebê be oyin nabî' be dewlletê bin
Bêgane çak e duşmin nek duşminî le xotan

Romî weku benî mûn kes piştiyan pê nebestê
Kewtûne dawî xoyan, sergeşte mawin û heyran

Kiwa walîyî Senenduc, begzadey Rewandur
Kiwa hakimanî Baban, mîrî Cizîr û Botan

Ew ayetey fe sîrû fî-l erzî Xuwa ke fermûy
Îcray deken segane bî-n nefsî şahî xoyan

Kiwa ew demey ke kurdan azad û serbexo bûn
Sulltanî mullk û mîllet, sahîbî ceyş û 'îrfan

Coşêk biden weku heng, tegbîr biken be bê deng
Esbabî şerr peyda ken top û tifeng û hawan

Parranewe û tewekkul lem 'esre pare naka
Tîre du'ay cewşen peykan e hîrzî meydan

Boçî beşîrî ême ye'nî resûlî ekrem
Hîç ed'îyey nezanî rojê ke deçuwe meydan

Wek Xêwe û Buxara, bellam narrwa be hîmmet
Ref'î biken meşayix, def'î biken melatan

Her şêxê kewte şiwênî yek dû kesî reş û rût
Xellkî be mûr dezanê, xoy hezretî Suleyman

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Yektan neçûne gerdiş wa tê degen le dinya
Her padşahî rom e û şahî ‘ecem le Taran

Qutbî zemane Xalîd aware bû weku min
Bê qedir û qîmet û şan, bê xan û man û bê nan

Şîr û qellem şerîk in lem ‘esre da, dirêxa
Şîrim qellemtiraş e û kalanî ye qellemdan!

Em me’sele meşhur e ger qurr dekey be serta
Îksîr e xak û xollî dermallî gewremallan

Tenha ême weha nîn, dîbaçey Mem û Zîn
Hallît deka çi lon e ehwallyan suxendan

Xotan dellên: Eger çî meşhûrî xas û ‘am e
Her rêwîyek gerra bê azatir e le şêran

Sed qa’îme û qesîde kes naykirrê be pûlê
Rozname û cerîde û kewtote qîmet û şan

Binwarre se’î û xîret êsta le dewlletî rom
Xoyan xezînedar in, xoyan tebîb û sulltan

Her diwênê ehlî Sûdan hestane pê weku şêr
Êstêke musteqîll in mehsûdî kullî edyan

Bulxar u sîrb û yonan, hem ermen û qeretax
Her pêncyan be te’dad nabin be qeddî baban

Her êke musteqîll in, kullêkî dewlletêk in
Sahîbî ceyş û rayet, erkanî herb û meydan

Hem heqqyane ermen xîretkeşî yektir in
Wek ême nîn le gell yek de’wa biken be şîran

Bo fennî herb û sen'et, bo zebt û rebtî mîllet
Deynêrine Urûpa gewre û biçûkî xoyan

Hacî kesêke bêkes bo êwe qurr depêwê
Gwêy lê degirin zerîf e, nagirin bella le xotan

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le Roma kewte ber çawim

Le Roma kewte ber çawim kesêkî ha'îm û heyran
Be hey'et û têy geyîm kurd e be şêwey ehlî Kurdistan

Ke çûme xidmetî pirsîm: Birader xellkî kam cêga yî?
Le kam la hatûyî? Girya, gutî: Baban! Gutim: Baban?

Dillim dawe, gutim: Bawke hemûman bêkes în lêre
Çi qewmawe, gelê heyf e, megiryê herweku baran

Gutî bo xurbet û rûtî nîye efxan û hawarim
Le daxî hakimî xome, le şan û şewketî turkan

Gelêkim bîstuwe pestî û billindîy dewlletan, emma
Cîhan neydîwe pestî wa mîsalî hallî Kurdistan

Le weqtî xoy hemû şa bûn, serapa bêxem û şa bûn
Le cûd da Hatemî Ta'î, le şerr da Rostemî meydan

Le pêşa xakî melaney pilling û şêrî aza bû
Emêsta mar û mêrû, gurg û rêwî lêy deken seyran

Le kiwê ma ne'retey teqle û cilît û rimb û rimbazî!
Le kiwê ma dengî zurrna û deholl û şayî û seyran!

Le harey şeş perr û nerrey siwar û berqî şeşxane.
Le teqqey nall û şeqqey sim, le reqqey tobiz û qellxan

Dehate cunbuş û lerzîn le mahî bigre ta mahî
Le sehra çende wehşî bûn le tirsan çûne ser kêwan

Le rîzî zebir û zengî wan kesêkî tir nebû hergîz
Be şîr û hîşmetî kurd e ke mawe dewlletî Êran

Sera û eywanyan êsta ke lawey kunde bû û cuxde
Eger meydan û dîwan e serapa bûyte cêy doman

Le paşî ew hemû giryan û nalle û zarîye pêm gut:
Ezîzim xem mexo hênde, le sayey rehmetî Rehman

Emîrêk mawe paşa ye. Gutî: Kê ye? Gutim: Şêr e
Gutî: Lêre? Gutim: Lêre, heta Taran û Hîndistan

Be xoy şêr e weku nawî, le şerr da duşmin endaze
Temayan her be ew mawe cemî'î xakî Kurdistan

Heçî cêgey umêdman e û ewî dill xoş deka emrro
Kesî dî lew be der nabête xemxorî gelî kurdan

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Perçem û fêsî keçî

Perçem û fêsî keçî to ey ciwan
Tacî keyane û ‘elemî kawyan

Min le xemit rêgeyekim kewte ber
Xwanî beheşt e û seferî heft xwan

Bêjenî çahî zeqenî to ye dill
Rahî necatî felek û rêsman

Tîrî mujet bo dillî esfendîyar
Tîrî gezî Rostemî Mazenderan

Fîrqetî to leşkirî êranî ye
Sebrî minîş leşkirî tûranîyan

Besîyetî sa xwênî sîyaweş nîye
Can û dilit birduwe hem dînman

Hacî ye fîrdewsî kurd, sa etoş
Giwê weku Mehmûd mede qewlî bedan

Felek be tîr û kemanî

Felek be tîr û kemanî le ême çûyte kemîn
Şikargahî zemîn e, le çengî kê we deçîn!

Dexate gerdenî ême mîsalî dabestû,
Gurîsekî bellekî subh û şam û natirsîn

Be huqqebazî û le'bî zemane naxelletêyin
Emêste pê dekenîn û le axîra degirîn

Emîn mebe le sibeynî emet be ser dênê
Hewadîsatî zemane kenayet e texmîn

Wicûdî ême ke rojî heyatî awa bû
Be qîn bizane ke şew lê gerraw û derbeder în

Em erze kone hewar e, xelayiqîş koç e
Tema'î sûrî nebê kes le jêrî çadirî şîn

Dû gez zemîn û sê gez caw û miste xollêk e
Lîbasî pêxef û rayex heta degate serîn

Seba musellemî afaqe qasîdî xureba yî
Enîsî yarî û hemrrazî 'aşîqî xemgîn

Sibeynê heste meweste xeber bigeyîne willat
Dîyar e çende hezîn û xerîb û bêkeyf în

Ke çûye ser hedî Baban û êlekey Cafan
Bigiryê herweku baranî mahî ferwerdîn

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le qurr binîşe billê: Qewm û qîle haware
Esîr e Keyfî le Roma le hebsî zêrî zemîn

Le kurdî bigre heta turk û ʻareb û ecemî
Le ax û daxî desûtên û şîn deken degirîn

Le kiwêredêyê ke Keyfî tîya bê fîrdews e
Cehennek e ke nema keyfî şarî Qustentîn

Hezîn û derhemî em şare zorî bêgane n
Le hesretî eceba şarezûrî çen degirîn!

Gelê henaseyî kêşa û çawî xoy gêrra
Kesî nedî le ʻeşîret, le daxî çon nemirîn!

Zubanî kurdî û turkî û farisî û ʻerebî
Wehay dezanî weku beytî Xusrew û Şîrîn

Emeş delîl e le teʼsîrî mersîyey ke gutim:
Çiwar zubanî tê da ye qesîdeyî rengîn

Dirêx ve hesret ez an şehbaze sidrenişîn
Bida merg fitad ve bi xak gişt defîn

Zu llewheê xet mewzûnê qitʼeê menzûm
Xecel şud Îbnu Hîlal ve rewan Îbnu Metîn

Be kê billêm ke be Keyfî billê be keyf û sirûr:
Xemî nebê ke felek akîfatî çille guzîn

Cinûbuhum tetecafa ʻen medacîʼihim
Yestexfîrûne leke bîlxiduwwî hetta hîn

ʻEleyye teʼlû bî eʼla ccûdî ʻîbretuna
Meda zzemanî enûhu niyahe mundibîn

O gun ke asb kelamî zemane eyledî zîn
Kif kifayetî keyfîye vîrdîler dizgîn

Bu gîce keyfî efendî gurindî ru'ya diye
Cinande zimzeî xilman û hure oldî yeqîn

Kesildî matem nezminde zehrenk tarî
Taxildî hisretî nesrinde ʻuqdeî perwîn

Kebîrdir bu musîbet, ʻezîm waqiʻedir
Sexîr yazînet te'rîxî, xameî mişkîn

Le yek du lawe hetîwî le paş be cê mawe
Yekêkî bîkrî me'anî, duwanî tîflî hezîn

Emin ke mamî ewan im deyandeme udeba,
Kiçanî zadey teb'î letîfî heclenişîn

Welê kurranî reza nîn be xakî rom û dellên:
Le lay wîlayetewe çawenorrî mamî tir în

Qellem şka û murekkeb rija û name nema
Le daxî qafîye ta xoy geyande hah û enîn

Edîb û aqillî lem behre wek "tirrî bin gom"
Gelêkî wun buwe Hacî we çake lêy derçîn

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pîtî r

Em ahuwe

Em ahuwe mumkîn nîye nexçîrî be tedbîr
Hellnaxelletê bawkesegî pîre le tezwîr

Çahî zeqenî mehleke ey dill be gurîsî
Ew zullfe eger sîlsîle ye xot mexe nêw bîr

Ey badî seba min bibe sûdî nîye name
Teşrîhî ze'îfî min û xem nayete tehrîr

Ceyşî hebeşî zullfî le gell xettî be şerr hat
Sofî dillî bê çare le ber pê buwe hencîr

Bem muhrî Suleymanî zeman herweku Xurşîd
Dunya bigre bê mededî xencer û şemşîr

Bê dîtin û bê wasîte çatir le min û to
Hîç kes nîye neynasê eger şête eger jîr

Bê mînnet e ger xwanî welî nî'metî Hacî
Em şêxe çî ye, qunçkî pîwaz e, serî sîr
Destgîrît le 'emel da ke neka

Destgîrît le 'emel da ke neka murşîdî pîr,
Destî toy girtuwe, pêy bestûyî, manendî esîr

Rîşî wek şîr e beşîrit, ew e celladî ecel
Qollî mallîwetewe, destî le to dawete şîr

Ew demî hatime ser şekwe le xizm û kesî xom
Rostem û Yusifî gullpîrehenim kewtewe bîr

Mar û masîn debine ejderî sehra û neheng
Dest û pay bêserûpay zallime deyken be wezîr

Çûme parêzî, ke mujgan û birom dî le kemîn
Tîrî min bû be keman, piştî kemanim buwe tîr

Xefîye nayete lay ême le tarîkî şewa
Rojî rûnake detirsê le ‘ewam û le gizîr

Hacî wek dill to be girî ye be şiwênî mekewe
Askêk e be bezîn û be hera nayete gîr!

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pîtî s

Wişke sofî

Wişke sofî billê be şêxî teres
Ba be serma neyê mîsalî heres!

Eceba şa'îrî nenasîwe
Şêr û 'enqa dekate mûr û meges

Ker nebî! Kam piyawî pê xelleta,
Bengirêdan û tabirrîn û nefes

Ferqî nakes le gell segan nakem,
Ha be'eksî bixwênewe na kes

Hez dekey tê bigeyî le bêdînî
Bibe derwêşî şêxekan be hewes

Her zemanê ke giwêt zirîngawe,
Pêt dellê barî xot bibeste ceres

Çend pûlê eger bihênî eto
Qesrit xoştir debê le î her kes

Boçî Hacî nexwênî wek tûtî
Em zubane hezarî xiste qefes

Destî min damênî to

Destî min damênî to ey xamey muşkînnefes
Ba binûsîn maceray hîcranî yarî bulhewes

Dengî murxî dill deyê herdem le dawî zullfî ew
Wek le tarî ‘enkebûta zîrrey ballî meges

Ey Xuda çi bikem? Ecel lem lawe qesdî canî ye
Dilberîş nardûyetî: Can mallim e neyda be kes!

Tûtî hat û îddî’ay şekker fişanî to bika
Heqqî ew dû lêwe girtî hat û kewte nêw qefes

To dezanî xo hetîwît sebir bê Hacî nîye
Boçî men’î lê dekey gewwadî bêdîn hey teres!

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pîtî t

Mematim heyat e

Mematim heyat e, heyatim memat
Ke lêm tund debê ew demî îltîfat

Lebî nazenînî be xettî celî
Le Êranewey girtuwe ta Hîrat

Umer Gunbetî lezzetî datepî
Tektellûy şika zînî espî heyat

Tema'im bo dunya û 'uqba bixom
Emim çû le dest û ewim bo nehat

Le xurbet be şahî le bîr nakirê
Zemanî ciwanî û yadî willat

Le Quşxanewe ta demî Îçqella
Le Bayzaxewe ta mehelley Qellat

Hemû xizmî xom in dezanim dellên:
Le bêhurmetîman bû Hacî hellat!

Mahî ser çawey heyatim

Mahî serçawey heyatim kewte bend û dawî şest
Pişti destî xom le heywanî û le bê'arî negest

Kame Luqman kewte çengî pîrî, destî baneda
Kame Rostem tûşî bû, ney xist û dest û pêy nebest

Hênde sûret zor buwe, me'na le beyna win buwe
Êstekê bê sûret û me'na ye 'eybî bitperist

Xeyrî çawî nûstûy bêdarî to nemdîtuwe
Bênezer kirdin besîr û merdumî huşyar û mest

Zullfî bo def'î hucûmî leşkirî sulltanî xet
Kewte xak û serkeşî dana weku 'ehdî "eles!"t

Ba wicûdî newcewanî xettî sewzî derkewê
'Ehd û peymanî nebû mû, bo ye pişti pê nebest

Dawe mûyekî be dunya û be ma fîha nedey
Hacî ger ehbabekî canî be canît kewte dest!

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Be qisey bê ser û pa tallî meke

Be qisey bê ser û pa tallî meke lezzetî xot
Bê mubalat mesûtêne çiray fîkretî xot

Halle neqdîne ye, musteqbel û mazî peşm e,
Bê emel serfî meke sîm û zerrî fursetî xot

Ey Suleymanî zeman axîrî deygêrrîyewe
Be hîkayet weku xot selltenet û hîşmetî xot

Min be peyxam û be qasîd muteselî nabim
Ta ku bangim nekeye baregehî hezretî xot

Were ey dill besî ye, bîde seganî derî yar
Dillekey kutkutî min ya cigerî letletî xot

Zullfî seddef'e gutî: Xane xerab rûy mederê
Heyf e berbadî meke şanî min û şewketî xot

Boçî yaranî weten dill deşkênî Hacî
Zahîren naçîyewe to, basî meke xurbetî xot!

Ceberûtî ke şika

Ceberûtî ke şika dill le huzûrî melekût
Hate em ‘alemî nasûte xerîbêkî nesût

Naheq e şekwe le bê’ehdî û bêperwayî
Key wefayêkî eda kirduwe? Sed def’e zimût

Be gull û lale beharî ruxî razawetewe
Xayetî kiwêrî were hêç nebê seyrî ke be lût

Weku derya ye nesîmî seherî sebzey gull
Pêkewe mewc û hubabî deheja û debizût

Eş’es û Baqilî û Hatem û ger Hessanî
Dewlletî to be fenay nefs e, sikûnit be sikût

Herçî lew lawe neyê min le wê naynasimewe
Ewî nasîwte me’mûr e be emrî ceberût

Nanî xoy ta ku be tendûrî gerim pêwe neda
Narrwa Hacî eger çawî derênin be bizûPîtî û

Pîtî û

Eger lêdane meqsûdit

Eger lêdane meqsûdit befermû
Weger qetlle meramit ha desa zû

Le rêy Xuwa meyke tehsîldarî ême
Reqîbî kafir û bêdîn û bedxû

Şew û rojê debirjêm û deqirçêm
Be sûtin îktîfa nakem weku mû

Gelawêj e gelawêjî du çawit
Direwşawe, ser û rîşim sipî bû

Ke xoyan xiste behrî eşkî xwênîn
Dill û can bo tewafî xallî hîndû

Be qewlî tacirî deryayî exbar
Dillî dêwane tê çû, rohî derçû

Eger dîqqet biken Hacî dezanin
Le ber çî şêxekan wa bûne kendû!

Umêdî weslî tom zanî

Umêdî weslî tom zanî nîşaney bênîşanî bû
Ewey êmey firîb da îltîfatî ser zubanî bû

Le ser Tûrî ruxt Mûsa ke Fîre'wnî xetî la da
Le sîrrî zarî toy pirsî cewabî len teranî bû

Eger Mûsa û Dara bî le dinya behrewer nabî
Dezanî mensebî herdû şiwanî û aşewanî bû

Le sayey lêw û dinidanî le ber çawim nema şanî
Eger le'lî yemanî bû, weger ellmasî kanî bû

Meger bîstûyetî xettit le nêw çahî zenexdanit
Esîrî Yûsif e boye nizûlî karwanî bû

Ewî to hetbû û min nembû qerar û sebr û 'îzzet bû
Ewî min hembû to netbû wefa û mîhrebanî bû

Zemanî hall û sermayey bed û nîkit nebû kellkî
Le musteqbel billê Hacî le mazî da zemanî bû

Bûkî dinya

Bûkî dinya wek dellên wa bêheya û bêferr nebû
Hênde damenhellkira û hîz û mallangerr nebû

Rêy nîşanî ême da ew roje Adem derkira
Boyekî em ʻaleme bê şorriş û bê şerr nebû

Sofî bem renge ke wa goştî birakanî dexwa
Hîkmet e rîşî weku caran dirêj û pirr nebû

Nîsbetî ême û Urûpa qetrey derya nîye,
Boç ulul'ezmêk be ʻezmî be'setî pêy terr nebû

Kê gerrî pê kirdibûy tûşî bellay xotim bikey
Ew deme basî ʻezab û dozex û kewser nebû

Ey mehî dû hefte ta şems û qemer toyan nedî
Danegîrsan ew mîsalî agir, emyan girr nebû

Bem hemû tecrîde wa Hacî dillî xoşî nedî
Ta le etwar û qisey em dewre kiwêr û kerr nebû

Cûtserwakan

Udeba çak e

Udeba çak e lêm nebin derhem
Lem qise û lem hîkayetey deykem

Îdî'ayî her senayî'êk naken
Ta ku neyxwênin, îmtîhanî neken

Pêy dellên hîlebaz û kezzab e
Şêx Nebî xarîc e le em babe

Xaneqa û şêx û tekyekan yekser
Pêm billên nef'iyan çî ye axir!

Xeyrî te'lîmî tenbellîkirdin
Cem'î emlak û xeznekokirdin

Def'eyek îmtîhanyan naken
Tê bigen zehr e ya ne tiryak in

Le mehekkî biden eger weku zerr
Tê degen rêgirin we ya rehber

Dexîlî şêx û mêx mebin ebeda
Hîç kesê rizqî hîç kesê nada

Ey xerîkî rimûz û naz û nîyaz
Ewrupa fennî geywete î'caz

Qulleyî Îfilî le eflak e
'Eksî ew gerdişî le jêr xak e

Kureyî em zemîneyan pêwa
Xatirî to bê çûne cewîy sema

Qiseyê emrro deygirin le zuban
Sallê tir bot deken be bê nuqsan

Sedûpenca luxet zîyad deken
Sallî bo nawî sen'et û bo fen

Çînî ateşperist in êstakeş
Gebrî bêdîn û hîndûwî rûreş

Bo çî fermûyetî nebîyî emîn:
"Îtlubu 'îlmekum welew fî ssîn"

Nêr û mê lem hedîse ferqî nîye
Ger mela nehîyî fermû dînî nîye

To were fennê fêr be çît e le we
Gawir e, hîndû we, we yaxo cû we

Lazim e xul bixoy weku berdaş
Hemû qernêk degorrê emrî me'aş

Tenbellî karî hîz û bêxêr e
Destî mandî le ser zigî têr e

Ehlî cennet ne şiwan û gawan e
Sahîbî fenn û 'îlm û 'îrfan e

Faîdeyî ger bidaye zîkr û du'a
Debuwe Qarûn geday ser rêga

Herçî bêbehre ye le kesbî kemal
Debite derwêş û margir û hemmall

Le hedîsa heye hebîbî Xuda
Gutî: elkasîbu hebîbu lla

Mushefî Xuwa ye ‘alimî birsî
Be du nanî dedat û natirsî

Sofî wek tîşne bû le zîkrî hetaw
Sed niwêjî deda be kasek aw

Şî’î wek tîşne bû le sînezeden
Be dû qetre deda Huseyn û Hesen

Be qisey muxbîr û muerrîxî kon
Mîlletî Çîn e çarsed milyon

Ser be ser dewlletî hemû Japon
Zor be zehmet degate çil milyon

Ehlî Japon be fenn û sin’etî çak
Seyrî çon Çînî girt û kirdiye xak

Îttîhadî be îttîfaqî enam
Super e bo hewadîsî eyyam

Kurdî ême û agir û newt in
Pêkewe pûş û agir û newt in

Bê eger destî yektirî bigrin
Wek Sikender cîhan hemû degirin

Xwardin û setrî ‘ewret û sukna
Ba’îsî jîn e bo geda û paşa

Halletî wa ye çî le ser xak e
Xeyrî Îsa dellên le eflak e

Ew hemû medhî badew û dulber
Nûsrawe le sed hezar defter

Weku xemsey nîzamîy genc e
Ke le lay xellqî kîmya û genc e

Ya weku beytî Şîrin û Ferhad
Şî'rî Hacî le ber kiraye be yad

Êste mîllet debûne sahêbî cah
Yane hemtay ewlîya'u llah

Kê dellê kurdekan be îdrak in
Bes e em neqs e giwê le min naken

Le qisey saxî min xelel degirin
Wahîmey şêxekan le dill degirin

Ewî muhtacî nan û pîwaz e
Ba hetîwbaz e yane mêbaz e

Heyf e bo merdî sahîbî temyîz
Hênde basî mekanî pîsî û mîz

'Îşiqbazî û heway derwêşî
Mîlletî xiste feqr û bêîşî

Ew kesey dewllemendekî çak e
Bendey romî yanî napak e

Hemû mirdûy mîyan û simtî xo n
Beytî meddahyan be can dekirrin

Beytî min çunke kellkîyan degirê
Le xerîbî û bêkesî demirê

Ta le jêr barî romîyan nemirin
Zehmet e qedrê beytî min bigrin

Yane wek ehlî mexrîb êstakî
Çî ye nawit? Dellê: Xirîstakî

Bawkim Ehmed bû nawî, fikrim dê
Xellqî ladê bû, daykî min Fatê

Hacî sa besî ye sedhezar def'e
Pêm gutî: Em qisane bênef' e

Rojî ewwel le bende û azad
Xidmetî xellq e qîsmetî ekrad

Lêy gerrê qewmî to hemû mar in
Diz û hîz û pîyawkuj û har in

Mirî nawdarî wirçî naw dar e
Rastîyan xwar e, xwarî xunxwar e

Bawke her çonê to dellêy wa ye
Zen deken em qisane xorra ye

Qurşî kam cê bikem be ser xo da
Eme lêm bûyte 'îlletî sewda

Be qsey çake destyan degirim
Erkî nakem be lome ta demirim

Ya îlahî

Ya îlahî be ayetî munzel
Be çiwar yarî Ehmedî mursel

Bê newayanî mullkî Kurdistan
Her le gawanî ta degate şiwan

Le xewî cehl û metirsî û xefllet
Be xeber bên be nexmey rehmet

Pakî derçin le karî nabemehel
Romî rafirrênin bo derî esfel

Hacî ye şî'rekanî wek Kawe
Rojê debîyên direfşî helldawe

Ew roje

Ew roje be emrî heyyî mennan
Em ‘aleme pakî bû be tofan

Deyyarî nema le cînsî zî rûh
Xeyrî eme hate keştîy Nûh

Ew roje geyişte weqtî me’hûd
Westawe le ser çîyayekey Cûd

Her sê kurrî kirdiyane mesken
Ew cê û mekane mîslî gullşen

Êstake Cizîre bê muhaba
Me’mûrey ewwel e le dunya

Ewlay sehîhan be burhan
Kurd in le mekanî ceddî xoyan

Sukkanî bîladî rub’î meskûn
Bilcumle le mane munşe’îb bûn

Bêtefirete bûn mutî’ û hem deng
Hem meşreb û hem lîbas û hem reng

Ayîn û mezahîb û resaîl
Wa kirdiye fîrqe û qebaîl

Wek xellqî neçûne mullkî edna
Cêy bawkî xoyan kirde me’wa

Arê be hedîs û nessî Quran
Hubbî weten e delîlî îman

Hadîs nîye, esl e giftûgoyan
Mewrûs e le dewrî ceddî xoyan

Êstake ke wa cema'etî wan
Esl in be neseb kerîm û şuc'an

Munqadî 'ecem, mutî'î rom in
Mehkûmî xerat û hîz û dom in

Teqsîrî ewan nîye emane
Hergîz be te'eccubî mezane

Resmêkî qedîm e dewrî gerdûn
Xesmî nuceba ye, hemdemî dûn

Hacî eminîş mîsalî kurdan
Kewtûme kemendî nefs û şeytan

Lem hebs û kemende fîkrî derçûn
Mumkîn nîye, min yek im ewan dû n

Mewqûf e be rostemî 'înayet
Muhtac e be hîmmet û hîdayet

Derçem le esîrî mîslî bêjen
Rahî bû be quwetî tehemten

Ey bê bedel û şerîk û tenha
Ma e'zeme şe'nuke te'ala

Te'yîn bike rostemî dîrayet
Tewsen bide xusrewî 'înayet

Ta kurd û emin le destî dûnan
Derçîn, her etoy rehîm û rehman

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ta rêk nekewin

Ta rêk nekewin qebîlî ekrad
Her wa debine xerabeabad

Enwa'î mîlel le gewre ta çûk
Xemllîwe memalîkî weku bûk

Yek berg in û yek zuban û yek reng
Bê xeybet û 'eyb û 'ar û bê deng

Dinya be tirran dexon û deyden
Her çonê meramyan e deyken

Her kurd in eger çî pakî merd in
Pamalî zemane, mîslî gerd in

Her manewe bênewa û mezllûm,
Wek bûmî xerabezar, meş'ûm

Ger ba'îsî em depirsî kam e
Şertêk e ke bo hemû temam e

Ew şerte be kullî îttîfaq e,
Ger Mer'eş û Wan e ger Îraq e

Qesrêk e yesaxî ew, nîfaq e
Ger wa nebê babî her be taq e

Sed şêx û mela û emîr û xanî
Bo lezzetî 'eyş û zîndeganî

Lew lawe ewan be hîlesazî
Lem lawe eman be teqllebazî

Qurryan be hemû willatewe da
Ta mull û re'iyye pakî fewta

Yekyan emî to dekey neyan kird
Xemyan nebû kurd eger hemû mird

Tacî bismî llahî rrehmnî rrehîm

Tacî bismî llahî rrehmnî rrehîm
Name ser bo def'î şeytanî recîm

Macerayêkim heye bê bêş û kem
Hîç diroy tê da nîye ba bot bikem

Banîyî no taqî qubbey bêstûn
Ke'beyêkî bo me kirde rênimûn

Qasîdî peyxamî fermûy: Men bena
Mescîden yubna lehu kema

Baz fermûy ser be ser rûy zemîn
Mescîd e bo zîkrî rebbî l 'alemîn

Ye'nî her mallê kira bê bo Xuda,
Ke'bey 'elya ye bo zîkir û du'a

Şikllî tekye û xaneqahî şêxekan
Waqî'en rengîn e emma bo rîyan

Lem hemû şêx û murîdaney rîya
Ferdekî naçête mizgewtî Xuda

Mescîd û mîhrab û mînber bêkes e
Her mepirse hallî çon e medrese

Şeyxena ger em qiset nayête giwê
Seyrî wa çolle kerî tê da bigê

Nakirê bem hay û hûye def'î rûs
Herwekû şêxî Buxara û Endelûs

Mîslî êwe pallyan da be du'a
Axîrî kafir be rîşyan da rîya

Piştiyan da hîmmet û şeyxûxetî
Ta feransiz pakî kirde mîlletî

Merqedî eqtab û qubbey ehlî raz
Bote cêgey gagel û mollgey beraz

Hînd û Daxistan û Qazan û Qirim
Xêwe û Hînd û Buxara û Xiwarrezim

Yek be yek wek êwe bûn û zêdetir
Ser be ser bo barî kafir bûne ker

Mu'cîze û keşf û keramat û du'a
Bo çî neybû fexrî 'alem mistefa

Cîsmî nûrîn û didanî gewherîn
Ew şika, emyan buwe cêgay birîn

Sebhe û mîswak û xerqe û teylesan
Bûne pabendî cîhadî xazîyan

Em hemû şehbaze bûne kundebû
Xellwe kêşan û çile sûdî çi bû

Seyrî nakey taîfey ew şêxekan
Wek sehabe û 'adetî pêşînyan

Rût û pêxawis be zergêk û metall
Bawkî bo dû pûl derdeynê le çall

Qesrî dîn, binc û binaxey mehkemî
Şîr e û tîr e dîrek û taq û xemî

Musbhet e fermûy hebîbî kîbrîya
Min nebîyî şîr im le meydanî wexa

Gullşenî pirrmîwey baxî me'ad,
Wa le jêrî sayey tîxî cîhad

Kê gutî: Mîswak e tîrim ya 'esa
Nêzeme gurzî giranim munteşa

Ya kemendim ruşte ye, tîxim teber
Post û keşkoll û defe û tac û kemer

Kam hedîs û ayetî mu'cîz numa,
Hatuwe bo rexbetî reqs û sema

Em îşarate be cêgaye û be rê
Nek wekû çawbest e terrkî bin berrê

Darî dinya her kesêkî têy geyî
Mîwey xamî heye û mîwey geyî

Pendî min xamî dezanin xamekan
Şîrin û puxtey dezanin puxtekan

Takî dunya maye puxtey her heye
Lem ker û xamey ke hen bakim nîye

Ba billên: Em şête qehpe mirduwe
Çend werrîwe, çend wirrêney kirduwe!

Heq te'ala waqîfî ehwallim e
Xalîsen lî llahîye terqîmî eme

Beytekan ‘eybî meken xwar û keç in
Meqsed im lem bend û bawe derbiçin

Werinê em dunyaye nefsî çî ye!
Ger le ber êwe nebê bakim çî ye!

Min le tofana berrî xom derdekem
Wa mezane damenî xom terr dekem

Êste herçîm pê billên ‘eybî nîye
Çunke însan ‘îlmî xeybî pê nîye

Axîrî çî wehşî ye mallî debê
Cahîlîş ew roje dê hallî debê

Em qise ba lêre bê mandî bûm
Bot bikem basêkî boyan kirdûm

Pêy gutim: Ehbabekî sahêb heşem
Ser guzeştêkim heye ba bot bikem

Bazî xew îmşew le ber bêhemdemî
Bû be nesrî asmanî hewtemî

Zaxekey şew baweşênî şaperrî
Şem’ekeyî kujandewe weqtê firrî

Beyzekî cê ma le gell derkewtinî
Asman zerd û sipî bû damenî

Mahî bêmîhrim le derga hate jûr
Matem û şîn û xemî kirdim be sûr!

Kurt û kirmancî ke girtim be reza
Xistim û baqî weku beytî Reza

Çunke zanîm îş ke kewte giftûgo
Bêserûpê ye weku çewgan û go

Axîrî nayê weku rûbar û çom
Ya şerre ciwênî le nîw xerrat û dom

Çî pîyaw bê tê dega romî çî ye
Basî rimbazî û siwarî bo nîye

Îttîfaqî dulberêkî bêkeder
Hacî enwa'î lîbasî kirde ber

Bê cîyaz û mareyî deyda be şû
Lem hemû kurdane daxwazî nebû

'Aqîbet deyxwazin emma ew demî
Pîr buwe, nazê kel û kome demî

Ew zemanî bûne ardî nêw dirik
Pareyek naka dû sed car bête rik

Şêx Bizeynî

Şêx Bizeynî qisey weku Caf e
Xo keramet nîye emîş laf e

Ew weku ême nîn be îdrak in
Sahîbî nusxey gelê çak in

Weku Behram û Xusrew û Şîrîn
Leyl û Mecnûn û çendî wa rengîn

Hemûyan remz û kanîy ‘îrfan in
Fêrî bin çunke xizmî xoman in

»Memozîn« û »Dîwanî« Şêxî Cizîr
Gelê çak in be sehlî bênine gîr

Em duwane emêste tercemeyan
Zor e hetta le nêwim ferrengistan

Way bixwênin le wechî muhtacî
Wa bizanin be xoyetî Hacî

Hem rewacî biden le her lawe
Tê negen mirdûm, billên: Mawe

Qet tesewwir meken terefdarî
Xeyrî xîretkeşî û xemxwarî

Kim kesêk zemaney nakes
Daybirrîwim le qewm û qîle û kes

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Her min im êsta warisî Îsa
Bê jin û mall û bê kurr û me'wa

Xo dezanin sulaley ekrad

Xo dezanin sulaley ekrad
Lêre we bigre ta degate Qubad

Hemû ʻalîm, hemû şêx û mîr in
Zîrek û jîr û ehlî tedbîr in

Wesetî panî pazde roj rê ye
Pirr le reşmall û xanew û dê ye

Be dirêjî le qaf ke raburdin
Ta be Şîraz û Esfehan kurd in

Şehsewar in, pîyadeyan aza n
Berdî nîşan û kullkî meydan

Dan û bexşînan le la baw e
Xûnî meydanyan le kin aw e

Be şeca'et hemû weku Rostem
Be sexawet hemû weku Hatem

Le wefa Simweîl û Îsma'îl
ʻEhd û peymanyan çiyay Qendîl

Gurdî Şaname pakyan kurd e
Kafî em safe kafî ew wirde

Le şerra zor def'e qewmawe
Romîyanyan çi lon cewab dawe

Hacî demirê le dax û haware
Kurdî bêçare debine aware

Hakim û mîrekanî Kurdistan

Hakim û mîrekanî Kurdistan
Her le Botanewe heta Baban

Yek be yek hafîzî şerî'et bûn
Seyyidî qewm û şêxî mîllet bûn

Seyyid û şêxekan le tirsî ewan
Munzewî bûn û zakîrî rehman

Her ke fewtan rîyay ewan derkewt
Seyrî çon bûne pûş û agir û newt

Yekê lem lawe rû dekate 'ecem
Dû le ew lawe debine dujminî hem

Dû hezar fesad kira lem la
Bûne qatîl ewanî tir lew la

Yek be yek bûne naîbî Hemewend
Sahîbî Martîn û marî gezend

Mîlletîş hênd ker in weku caran
Destyan maç deken dellên qurban

Ger le sehra mela nemirdaye
Gurgeşîn ba kerî bixwardaye

Şêrî dirrunde wek le bêşe nema
Gurg û mam rêwî dêne reqs û sema

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Min le xemxwarî em qisane dekem
Werine peşme le lam hemû ‘alem

Em qisey êste ‘eybî lê degirin
Ew demeş dê ke êwe boy demirin

Em be ew, ew be em dellê kake
Seyrî qanûnî Hacî çend çak e!

Her çi lonê îşaretî fermû,
Wek keramet hemûy weha derçû

Xusrew û Keyqubad

Xusrew û Keyqubad Eskender
Weku Kîsra û Kawis û Qeyser

Hemû têk çûn û pakî fewtawe
Ne sîlah û ne sikkeyan mawe

Waqî'en wa ye wek beyanim kird
Her kesê za be na'îlacî mird

Merg û jîn mîslî sêber û taw e
Ewî baqî bimênê her naw e

Çunke herçî le darî dunya ye
Dêt û derrwa, hemûy weku ba ye

Sed şehenşah û padişa mirdin
Seyrî ke kurdî ême her kurd in

Mîllet e baqî, ma beqa fanî
Her le cafî heta be goranî

Hesretim her em e le dinya da
Hacî demirê be dewrîyan naga

Ger be dewranyan bigeyîyaye
Hemû hallî debûn çi derya ye

Çi be mensûr û gewherî kurdî
Çi be nezm û kîtabetî wirdî

Se'dî eyyamî xoy nebû nanî
Weku min bû gerrok û bê xanî

Êste xallqî le hesretî demirin
Beytekanî le zêrr û zîw degirin

Axîrî rojekîş deyê we'dî
Xefetim bo bixon weku Se'dî

Qazîy nesr û muftîy nazîm
Tê degen ta muderrîs û 'alîm

Bo tesîhey zubanî kurdane
Şî'rekanim delîl û burhan e

Ye'nî ta mawe şa'irî xerra
'Alîm û 'amî daxî bo naxwa

Lakîn ew sa'etey be rehmet çû
Qurr depêwin dellên: Çi hîkmet bû!

Peşme Hacî were weku caran
Bêrewe ser hîkatetî kurdan

Şehsewarî belaxetî kurdan

Şehsewarî belaxetî kurdan
Yekke tazî fesahetî Baban

Mistefa ye texellusî kurdî
Xezelî kirde berbutî kurdî

Nawî sahêbqiranî xasî ew e
Çunke lem ‘erse espî ew bedew e

Ew ke noşî şerabekî tallî
Nalî lew ‘erse da buwe talî

Nalî ustadekî gelê ça bû
Xidirî abî heyatî me’na bû

Yekê tir bû Muhemmedî Fîkrî,
Mûy deengawt be tîrekî fîkrî

Yekê Rencûrî ehlî Kerkûk e
Fîkrî bîkrî hemû weku bûk e

Yekî tiryan Emîn Begî Dizeyî
Diz nîye şa‘îrêk e cerbezeyî

Keyfî hacet nîye bikem basî
Em kitêbey bixûnî deynasî

Salîm û Meşwî, Şêx Reza û Xeste
Şa’îr in her çuwarî berceste

Wek Wefayî kem e le şu‘rayî
Xetî wek beytî çak û espayî

Le kun û qujbinî kelawey dehr
Çendî tir hen mîsalî gencî guher

Sebkî camî n û xîretî Selman
Beytîyan win buwe weku xoyan

Melkeqorr û Hîmarî û Kîseşkel
Qîs mîn esmaîhîm we la tes’el

Şî‘rîyan ciwan e bes nîye kurd in
Gerçî bednaw in û gelê wird in

Be fîdayan dekem sed Îbnu Yemîn
Çunke derbestî xîretî kurdî’n

Le Cizîre yekêk e Şêx Ehmed
Sahîbî naw û murşîdî erşed

Ewî Camî gutûyetî eme ye
Lew qise û medhe meqsedî eme ye

Pîr mirdî bidîde em zi Cizîr
Nîk mirdî bidîde em zi Herîr

Ehmedî Xanî sahîbî »Memozîn«
Şahbazî fezay ‘îllîyîn

Xelefî ew debin le Godîngan
Le Cizîr pêy dellên Feqê Teyran

Şa‘îrî êre gerçî zor mawin
Em dû sêyen ke wa le pêş çaw in

Çend ewendey ke ‘erzî êwem kird
Şu‘eraman heye be dest û bird

Şa‘îrî kon û tazûy kurdan
Ke le te’dadî ‘acîz e însan

Ewî xom dîwme yane xo eserî
Eme ye bot dellêm be muxteserî

Me’denî ‘îlm û ‘alîmî ‘amîl
Qutbî dewran û murşîdî kamîl

Her le ewwell cenabî mewlana
Neqişbendî rewaqî îllella

Xewsî Sanî û Hatemî mezheb
‘Ebdurrehmanî xalisî meşreb

Weku Bêtûşî şa’îrî ‘erebî
Ta qîyamet ne kes buwe û ne debî

Şa‘îrî Caf û nezmî etrafî
Mewlewî û Xane kafî ye û şafî

Ewî serxêllî ‘êlî ewzan e
Le ‘eşayir Mela Welledxan e

Xo Mela Mistefay Bêsaran
Bê nezîr e le nezmî Kurdistan

Melkeman melkemûtî me’na ye
Ye’nî her çonê hez bika wa ye

Wek Mela Xidirî Rûdibarî nîye
Şî’rî abî heyat e tarîy nîye

Hîkmet û nezmî Mîrza Ye'qûb
Wek Filatûn e lefzekan wek kûb

Ye'nî fîkrî le asman be der e
Ba'îsî 'eyş e, dafî'î keder e

Hesenî bawkî Feqê Omer
Kurrî Omer, Muhemmedî serwer

Mencellî nezmî gewre û giçke'n
Bo xeyallatî 'eynî sê kuçken

Şa'îrî Zengene nîye heddî
Weku şuc'anî nakirê 'eddî

Çunke mecmû'î teb'î mewzûn e
Sîneyan mîslî ayine rûn e

Întîxab nakirê le ber çakî
Wek le şerr da siwar û çalakî

Dû wehîd in Muhemmed û Ehmed
Yekê komasî ye yekê derbend

Hemewendîş ke xizmî xoman in
Şa'îrî zor e pakî deyzanin

Çunke tîjîy zubanyan yekser
Kewte nûkî rim û demî xencer

Bê kitêb in, eme le wan dûr e
Merdî aza le naqîsan dûr e

Deştî Kerkûk û kêwî Hewraman
Şa'îrî zor e bê hed û payan

Sade her nawyan bikem îmla
Em kitêbe biçûk e beş naka

Her le Şîrazewe heta Baban
Pakî yek nezm e pêy dellên Goran

Her le Mûsill heta hedî Baban
Beytîyan kirduwe weku cafan

Besî ye bê'arî ey gelî xizman
Lem hemû beytî mîlletî xoman

Eger ême û sine û suleymanî n
Nawî yekyan be çakî nazanîn

Wek Muhemmed Henîfe beytî metîn
Nîye îlla hesarî Qustentîn

Beytî Dimdim ke qedrî nazanin
Pakî sîhrî hellallî kurdan in

Weku Şaname ger binûsraye
Lêt mu'eyyen debû çi westa ye

Espî reş beytî ta billêy çak e
Nezmî yegcar siwar û çalak e

Espî şeşpêyî qehremanî 'ecem
Mehzî kîzb e be îttîfaqî umem

Çunke nûsrawe xellkî deyxûnin
Lem hemû beytî ême da kor in

Were emca le hesretan memire
Çiwar pelî espî sunnîyan megire

Weku beytî Hetem le de'wa da
Nîye, Fîrdewsî sed kilik bada

Em fesîhane pakî bênaw in
Ba'îsî pêt billêm nenûsraw in

Dû 'Elîn şa'îr in weku Hessan
Berdeşan û Herîr e meskenyan

Yekê hemnamî xom be xom dîbûm
Şêx Wesanî bû merdekî me'lûm

Weku min bû be zahîrî cahîl
Batînen şa'îrêkî zor kamîl

Ehmedî kor le şarî Sabllax e
Beytekî dax e, beytekî bax e

Eme mecmû'î şa'îrî xerran
Herweku mesnewî n le nêw kurdan

Hemûyan bênezîr û yek wezn in
Qabîlî bezm û layîqî rezm in

Xeyrî Dimdim le man be nezme cuda
Bê seda tepllî nezmî deng nada

Be rewanî mîsalî abî rewan
Îrtîcalî n hemû be bê daman

Kullî beytêkî dûhezar ferd in
Mangekî pê dewê le ber kirdin

Eme her kurd e layîqî tehsîn
Bê kitêb û mu'ellîm û nûsîn

Kame mindall û şêtî lê bigrî
Her ke bîstî be carê dête berî

Êste me'lûmî bû hemû mîllet
Ey melay ders û muftîy ummet

Ême bêxîret în û bê'ar în
Ewî ney xwênduwe leme arîn

Qeydu tezbîb û şerh û haşiyekan
Bûne seddî me'arîfî kurdan

Hasllî ême wek dekem texmîn
Kirmî awrîşm în û mêşhengiwîn

Nîye aram û rahetî û xewtin
Şew û rojê heta dirustî deken

Ke çî romî ke ême deynasîn
Wa dezanê ke ême nesnas în

Yane êranîyek ke me'lûm e
Daykî muť e, bawkî mewhûm e

Eme deykate kase deynoşî,
Ew ke way lê dekat û deyposî

Selamu llahî minnî kulle yewmîn

Selamu llahî minnî kulle yewmîn
Le eshabanî sahêb xîret û dîn

Le bê ‘arî hemûyan kewte yadim
Rumûzî îttîfaqî û êttîhadim

Le ber dûrî le eqran û le emsal
Le kurdanim depirsî zerbu l emsal

Le bo em yek-dû eş’arî reş û rût
Heta peyda bû rohim geyîye ser lût

Defermûy em ‘ezabe bo çi dekêşî
Çi melzûm e eger çawit neyêşî

Qurrî kiwê kem be ser xoma le xurbet
Xewim nayê le daxî mollk û mîllet

Eger wek min xeberdar bin le dewllet
Le heyfan xo dexinkênin be bê pet

Çiwar milyon e Kurdistan nifûsî
Be qîssey ehlî texmînî ke nûsî

Hemûyan şêrî bêşe n Hatemî cûd
Le şerr da kêwî Cûdî û behrî memdûd

Welêkîn faîdey çî herc û merc in
Le de’wa da le gell yektir be merc in

Le giwêy ga nûstû n herçend e şêr in
Weku kerwêşkî çaw rama û kiwêr in

Ewî ‘ela ye serdestey şikar e
Ewî edna ye bestey zullfî yar e

Ewî aza ye Şehname dexwênê
Ewî miskên e genim û co deçênê

Emane bêşi’ûr û gêjûwêj in
Mutî’î lotî xwêrrî û herzebêj in

Kurrêkî wa nebû hestête ser pê
Bizanê xellqî çon kewtûne ser rê

Bika seyrî cerîde û hallî mîllet
Kitêbî taze û te’rîxî dewllet

Bizanê ta çi qewmawe le etraf
Serapa agir e etraf û eknaf

Eger karêk neken lem beyne da zû
Memalîk katekî zanît le dest çû

Gemî sehra û derya dête cewlan
Be xeyrî pêkurrey fewcî siwaran

Be tirr xanî be ser naçê, le me û paş
Le her la we detan harrin weku aş

Le jêr pê da deçin heyf û mixabin
Geda bin êwe, duşmintan beşa bin

Be xeyrî romê û îngilîz u rûsî
Bê hedd in dewlletan nawyan binûsî

Le cêy xoyan hellistawin be xîret
Le dinya nawî xoyan nawe dewllet

Serapa sahêbî sikke û supah in
Weku cem sahêbî text û kulah in

Le tedbîrî umûrî mullkî xoyan
Şerîk in pînedoz û şah û gawan

Le her weqtê yekêkî bête hawar
Le cutyar û şiwan û ehlî bazarr

Le coşîn û le nêşa mêşî heng in
Be min çî kafir in yane ferreng in

Weku bîstûme bo def'î mesaîb
Eme tedbîrî kurt û fîkrî saîb

Le deşt û dê û wîlayet bibine ehbab
Weku şexsêkî wahîd bin le her bab

Le Botan ta Beban û Serhedî rey
Le ew latir weha noş bête ser dey

Bibîne yek le te'lîm û le nûsîn
Cil û berg û zuban û resm û ayîn

Şa'îr û şêx û xiwace derbeder in

Şa'îr û şêx û xiwace derbeder in
Le qisey bênetîce da demirin

Basî zullfî dirêj û çawî bexew
Nebirrawe buwe tirrî Xusrew

Qeyd û tezbîb û haşîye û î'rab
Hemû ba birdî bûne mewcî serab

Sefeser ender weten çi kellik degirê
Seyrî nakey şemendefer defirrê

Be qisey sade birsî têr nabê
'Emel e 'îzzî dîn û dunya bê

Asinî sard be fû nerim nabê
Be tirranîş hemam gerim nabê

Telixrafîş telêk e bêma ye
Muxbîrî rûy kullî dunya ye

Cewherî ferdî ew mucezza bû
Ya nebû, hasillî çi peyda bû

Giftûgo hasîlî hemûy ba ye
'Emelîyat e nanî tê daye

'Ulemaman be qewlî bêserûpa
Pakî xinka le behrî wişkî hewa

Sin’etêk fêr nebûn le paş tehsîl
Seyrî çon bo menahî bûne delîl

Yek be yek bûne xaînî dewllet
Xaînî mullk û duşminî mîllet

Ta te’înatî kor û lall mabû
Le gelê dêyekan melay ça bû

Ew duwane be rehmetî Xuwa çûn
Şarekan bê mela û muderrîs bûn

Bellê wa ye le elzemî eşya
Ewwelen xwardin e, duwem sukna

Sêyemî tirsî ‘ewret e enca
Meşxeley la îlahe îlla lla

Piştîwanî bînay şer’î metîn
Şîr û bexşîn û xamey rengîn

Bew şeşe dîn muhafeze dekirê
Yekê mird lem şeşane dîn demirê

‘Eceba bo çî ehlî mullkî ‘Êraq
Îttîfaqî bedel deken be nîfaq

Bo emîranî xeyre debine gizîr
Nek le xoyan yekêkî bête emîr

Êstekeş firsete gelî yaran
Kepenek bo çî ye le paş baran

Kurdekî koyî

Kurdekî koyî kewtewe yadim
Pêm gut: Aya çi lon e ustadim

Weku bîstî be mîslî hewrî behar
Hate giryan û pêy gutim: Ey yar

‘Alîmî çakman hemû fewtan
Ehlî fetwa musafîrî mewtan

Takî Qur’an bixûndirê be seda
Rezîye llahu ‘eleyhîm ebeda

Ewî mawin le lêwî kendall in
Cahîl û bêwiqûf û mindall in

Nîye Îbnî l Esîrê bête keman
Berdî Îbnî l Hîcr bikate nîşan

Pak be enwarî ‘alîm in muhtac
Bêdelîl e emêstekê mînhac

Kes nemawe be xeyrî kam Ehmed
Şeyxî me’rûf û ‘alîmî erşed

Çak e êsta deka le bo kurdan
Tercemey şer’ û ayetî Qur’an

Waqîyene xizmetî le bo Xuwa ye
Çi debû ger be kurdî nebiwaye

Her ke way gut weha mukedder bûm
Wam dezanî ke wa le dîn derçûm

Gutim: Êstaş le ser kerî mawî
Ça bû mistim neda le nêw çawî

Kurdî axir billê çî ye ‘eybî
Her kelamî heq e nîye ‘eybî

Lefzî kurdî billaw nebû gird bû
Wa le mabeynî ême da tê çû

Le fesahet bila mu’erra bê
Çi qîyamet! Be ermenîş nabê

Be zubanî keç û xetî xwarî
Be cerîde û kitêbî xellwarî

Çûne rîzî mu’ezzematî mîlel
Weqt e xoyan hîsab biken be duwel

Ya le gell farisî çi ferqî heye
Bo çî ew rast e, bo çî em keçe ye

Ba wicûdî eger bikey dîqqet
Tê degen kam le kamî ye sîrqet

Çunke ême qedîmitir în le ewan
Be tewarîxî cumley edyan

Axir em ‘eqlleyan hebû boyê
Ger Suleymanî ye we ya Koyê

Bûne ustadî farisî û tazî
Na geyiştin be fexrekey Razî

Çunke sermaye mallî xellqî bû
Weqtê mirdin hemû be hîç derçû

Eme me'lûmî 'aqill e û mindall
Nîye 'eybî munaqeşey emsal

Wek mirîşkê ke 'eqllî neyhênê
Bêt û hêlkey mirawî hellbênê

Wek bigate kenarî cogeleyek
Nayete şiwênî, bimirê, cocelleyek

Cêy eme wişk e, cêy ewî aw e
Tê dega qînig dirranî pê mawe

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le cumley maceray

Le cumley maceray dûrî wîlayet
Emeş basêk e xoş e wek hîkayet

Şewê danîştibûm bê şem' û mîsbah
Etoy hênawe yadim kake Fettah

Gutî: Ba kaxezêkî bo binêrîn
Muhîbbî sadîq e û hemrrazî dêrîn

Minîş em nameyem nûsî be te'cîl
Şirrûwirr wek xerar û kone zenbîl

Be bê teswîd û teshîh û mubalat
Weku beytî bile her çonê bom hat

Bellam efkarî xom e nezmî kurdî
Le xumxaney xeyallî saf û wirdî

'Îbaratî "dehrî" û "tazî"-m nehêna
Dezanê mallî xome merdî dana

Le ber pîrî emende bêhewas im
Dellêy erkanî îslamî înas im

Ser û rîşim serapa bote lok e
Be şew hemrraz me pişmîn û koke

Xerîbî xurbetî kirdim be ewtan
Serapa erzî lê kirdûme zîndan

Welêkîn to kerîm îbnul kerîm î
Be rehmet babî eş'arî yetîmî

Eto mawê le nuqqadî wîlayet
Ewanî tir hemû bûne hîkayet

Eger Nalî bû lêre nallî awêt
Dillî Kurdî buwe gerdê le ber pêt

Minîş katê dezanî pêm hellengût
Ecel bay serrserr êmeş perrûpût

Ke name geyîye êre morman kird
Min û Fettahî dana zefman kird

Celîman nûsî erqamî wisûlî
Be ummêdî qibûlîy bêfizûlî

Refîqanim le Koye aşna nîn
Wiqûfî hallî êmey bênewa nîn

Selamêk e dîyarîman dîyar e
Le dar û berdî ew dar û dîyar e

Xisûsen astaney ercumendî
Celîzadêk e 'Ebdulla Efendî

Çi 'Ebdulla 'Ubeydullahî ehrar
Musexxer bendeyêk e zerr xirrîdar

Zekawet kanîyêk e toy derawî
Xetî îqrarî nûsîwe Zehawî

Melayêkî feqê yane wîqarit
Beyanit aw e, girde îqtîdarit

‘Lûmit kafî ye û şafî be wacîb
Le kiwê to debite hacîb îbnu hacîb

Le daxî to desûtê Nefteweyhî
Weku bê zerd buwe rûy Sîbeweyhî

Le meydanî fesahet to mucellî
Herîrî talî ye û Se’dî musellî

Be xeyrî ceddî êwe kîh e dana
Le Kurdistan esasî ‘îlmî dana

Were ba bêyne ser basî nîhanî
Be yadî ‘eyş û eyyamî cewanî

Be fîkrit dê zemanê çûyne Ballek
Be pêxawsî ne kewşim bû ne kallek

Le ber pêm dirrk û dar û şax û barî
Weku mexmer bû nermî ya neqallî

Ke çûyne Sîngurre Sînem girrî best
Weku qendîlî sergerdan, weku mest

Dellên êsta hewarî gurg û şêran
Weku qelbî hesûdî to ye wêran

Çikawe awî pirj û golleşînî
Nemawe jiher le kotir ta şehînî

Gerûy şêxî le luqmey kuç û baran
Mu’rra ye mîsalî rozedaran

Eme dinya ye namînê heta ser
Le bo az û dana, hîz û maker

Mellê em qîsseye bê rê û hê ye
Le tirsî to nebê hêşta le kiwê ye

Le derdî dûrî û cewrî zemane
Gelê nezdîk e zor dûrî mezane

Le xom agir hellênim wek çinarok
Le çawim girye derbê wek hemamok

Be sed qeyd û hewaşî derdî dûrî
Beyanî nakirê xeyrez sebûrî

Le me û pêş şemmeyek ‘erzî etom kird
Billawe fîkr û ‘eqllim, weswesey kird

Ke wa bû çak e camey xom qeba kem
Berî dest hellbirrim rûy xom le Xuwa kem

Billêm ey razîqî mêşûle û fîl
Be heqqî Cubreîl û hem Sirafîl

Hellîkey beyreqî kurdî le dewran
Le mabeynî Kekon û Heybesulltan

Le şerq û xerbewe ta qît’ey Ko
Le ber goçamî emrit bê weku go

Dezanî zehmet e te’dadî yaran
Be sed hawîn û zistan û beharan

Dîyar e dostdaranî emin kê n
Le Xoşnaw û le Ako û deştî Bîtwên

Le ême her kesê pirsî temamî
Wekîlî mutlhqî serfî selam î

Weku min toş binûse bê te'emmul
Cewabî namekem manendî bilbil

Xerez destxettî to ye, na'îlacî
Billa me'nay nebê wek beytî Hacî

Le meydanî behara

Le meydanî behara şarekey Ko
Qubey kîşmîrî da ber şeq weku go

Le mabeynî Kekon û Heybesulltan
Nisêy êware û sayey sibeynan

Le lam zîllî huma ye çetrî senber
Çi cayê sêberî ser û sinewber

Beharî bo gull û bo mîwe payîz
Nezîrî ger billêm nabê be cayîz

Be rengî asman tamî nebat e
Be safî kewser û awî heyat e

Nimûney cennet e şîwî rezanî
Beharî şam e eyyamî xezanî

Gullî hacîlekanî deştî Hamûn
Nekey bîdey be nergiscarrî gerdûn

Le ser kêwan gullûk û laley sûr
Yedî beyzay Mûsa ye le ser Tûr

Le xunçey new demîdey bax û raxî
Dellêy gerdûn e hellgîrsa çiraxî

Demawendîş be nîsbet şaxî ême
Beharî çeşmesarî wişk e, dêm e

Le rêgay Ewrupayî gerçî westan
Le teswîrî weku ker pakî westan

Le kin Bîtwênî ême deştî Lacan
Weku rêy Bane ye, hewrazî Cêcan

Ehalî Rostem in weqtî şeca'et
Le Hatem zêtir in weqtî sexawet

Kurrî xîlman e, kiçyan 'eynî hûrî
Nezer baz in welêkîn dûrbedûrî

Be nîsbet 'îsmetî mêrdî le gell jin
Eqalîmî tir in ser sorî bê bin

Musafîrperwer û yarî xerîb in
Ewan in wa le her 'eybê berî bin

Le dîndarî feqêyan wek çîya ye
Melay bo gencî dîn Hacî qella ye

Meken men'im hemûy rast e meqalem
Be burhan û hedîsî fexrî 'alem

Weten mehbûbeyêk e hucre arayî
Nîşaney dîn û îman e temennayî

Le Adem bigre ta dewranî êsta
Yekêk e Hacî lew xake hellista

Ke xemxwarî bika bo mîlletî xoy
Le beynî gewrekan û şêxî bêpoy

Zemane tûşî derd û xurbetî kird
Xemî Koyê perêşanî hemûy kird

Be qeddî awegird e derdî dûrî
Nezîrî êçqella ye bê hizûrî

Dû axay mawe wek bîstûme exbar
Emîn Axa û Hem Axey sahîbî kar

Emîn û pişt̂wanî qesrî mîllet
Nîgehbanî xezîney dîn û dewllet

Le dinya da îlahî her bimênin
Biney bêîttîfaqî hellqenênin

Le qoç paşawe ta êsta emîrêk
Le Koy peyda neybû yaxud wezîrêk

Le ber bêêttîhadî bûne miskên
Le axîr da weku zanîwme helldên

Le mabeynî killawsûr û killawrreş
Perêşan û dîyar in mîslî gay beş

Le ber em natebayî û kînecoyî
Le lay romî zelîl in merdî koyî

Weku bîstûme ey yarî nîkopey
Le te'rîxî Cem û Eskender û Key

Be şîr û xame dewllet payedar e
Emin xamem heye, şîr nadîyar e

Ne beydaxî heye ne tepill û kûsî
Emendey pê kira bêçarenûsî

Wezîfey xom be cê hêna temamî
Be şîr û dewllete mîllet nîzamî

Ewa xoy kirde mehdî Hacî Qadir
Ne Nadir şay heye û ne şahî nadir

Were seyrî bizane lawî koyî

Were seyrî bizane lawî koyî,
Meh e danîştuwe ya seru we royî

Heyase û pestekî lay nêwe şanî
Ke way şîrdax û fês û camedanî

Be yexmay dawe xerqey şêxî hîndî
Rîda û teylesanî neqişbendî

Ke bîstî seydî dill lem dewre baw e
Le penca cêwe şestî zullfî nawe

Dillî wîstim dû çawî, danî xoş e
Dillim naye dillî bişkê, nexoş e

Girînim wek şewî payiz be taw e
Gullêkim biwe û le baxan da nemawe

Mellê xem gewre ye ya girye wird e
Eme gerdaw e, ewyan awegird e

Bes e ey xame ba em base pey bê
Were ser basekî wa faîdeyî bê

Emane qîsseyêk e zor kiraw e
Weku awî şewê tamî nemawe

Gelê sall e ehalî şarekey Ko
Şew û rojê le gell şêxanî bêpo

Mîsalî agir û agirperist in
Desûtên û hemîsan deyperistin

Le ‘ehdî “ker nebî” ta dewrî “ga kiwêr”
Le giwêy ga nûstû n, zor heyf e bo şêr

Le kin xotan fillan îbnî fillan in
Le dinya ayîn û oyîn dezanin

Ke çî keç meşrebêkî bêdîyanet
Be hîle mil denête ber ‘îbadet

Şerî’et ger bizanî ya nezanî
Weku ker deçine bin barî giranî

Le meş tenha nîye sûç û xetatan
Le kesbîş xafill in mîslî melatan

Le Bexda bo çî xorma bêt û leymûn
Le bo derman le şar bê ronî zeytûn

Le dewrî kullî baxî şarî Koyê
Dûsed bin darî zeytûnî be coyê

Le êwe kamtan bû êk dû barêk
Bikate kîseyek yaxud xerarêk

Dû pêy lê da le kola mîslî doşaw
Weku ron ronî zîtûn bête ser aw

We ya key nêjrawe çend nemamek
Le narinc û tûrunc û her meqamek

Bizanin şîn debê, nabê, be ber dê!
Le cêgay germ û sardî çî be ser dê!

Beraw û erzî êwe kîmîya ye
Durr û gewher gezo û mazûy çîya ye

Me'adîn xatirî to bê le gell kan
Genimtan zêrr e hetta zîw e zîwan

Rejûy wa porr û xwê û newt û gogird
Le kêwî êwe da ko ye weku gird

Le beynî mîlletî xotan beyarî
Biken teqsîmî şax û darûbarî

Dewen axir debête darî gewre
Merrî lerr xidmetî bo goştî çewr e

Le dinya da ewî baqî bimênê
Le 'uqba da gunahî pê nemênê

'Eta ye û husnî xulliq û îttîhadî
Îta'ey 'aliman e û şêxî hadî

Xerîkî kasibî û karî hellall e
Be xeyrî em ewanî tir betall e

Ewaney mullkî xoyan kirde dewllet
Weku bit deyperistin cem'î mîllet

Mîsalî êwe bûn yaxud weku min
Ewan bo çî pîyaw in ême wek jin

Sikender bo çî çarçaw û dûser bû
Fereydûn fîl û Kawe şêrî nerr bû?

Le dunya her kesê hesta be hîmmet
Fereydûnêk e, Eskender miruwwet

Le sayey şî rekanî wek Ferîdûn
Demênê Hacî ta dewranî gerdûn

Her kurd e

Her kurd e le beynî kullî mîllet
Bêbehir e le xwêndin û kîtabet

Bêgane be tercemey zubanî
Esrarî kitêbî xellqî zanî

Yekser ‘ulema dirişt û wirdî
Naxwêninewe dû herfî kurdî

Ustadî xet in le em sîyane
Wek dî le zubanî xoy nezan e

Mumkîn nîye derbiçê le çengî
Hetta reqem û xetî ferrengî

Sahîb kutub û peyam e her kes
Ême nebê bûyne qewmî çerkes

Kake ême mu’mîn în, ne rûsî n
Boç kifir e zubanman binûsîn?

Mîlletî bê kitêb û bê nûsîn
Xeyrî kurdan nîye le rûy zemîn

Sê qebîle heqîr û bê rûmet in
Kurd u rom û yehûdî gumrrah in

Rom û cû çak e îttîfaqî heye
Kurd e bêxîretî û nîfaqî heye

Cîngeney êre ba û cûdî ker in
Herweku domî ême derbeder in

Lêwe ‘aqilltir in be sed menseb
Kurrî xoyan denêrine mekteb

Êstekê amîranî Kurdistan
Her le Botanewe heta Baban

Lem hetîwanî mektebe n yekser
Kurdekan bar deken weku maker

Wa dîyar e heta ku dinya bê
Kurdekan hallyan debê wa bê

Cû çi qedrî heye le nêw kurdan
Xeyrî lêdan û ciwên û têhelldan

Halletî zêrdestî her wa ye
Nokerî karî çakî bo naye

Çiwarîn û parçe hellbest

1
Ya reb be qeder herfî Siyotî yek yek
Rehmet le musennîf û le qarî bê gelek

Emma ʻecem û ew kesî çapî dana
Bîbate cehennem be ʻezab û be kutek

2
Ey refîqanî weten zor xezelim mawe le wê
Le kenarêkewe teqdîr e weku hellbikewê

Wek sefîne bigerrê bîxene ber behrî qisem
Heyf e wek min le xerîbî bimirêt û netewê

3
Le ser deştî mîhnet perrey kirdewe
Kewanî bella lokey peykerim

Bellallûk e dermanî derdim dellên
Be pare wegîr nakewê bîkirrim

4
Ey ʻutarîd le derit xadîmî seccade be şan
Wey le koy fuseha da qellemit sinciqeşan

Hacî qadir nîye beytêkî weku êwe billê
Espî kon zehmet e derçê le gell ahû û rewşan

5
Neqdî ʻumrim be xezel da û dukanim dana
Hîç kesê neykirrî, tirsam le rizîn û le xuran

Bê beha dame em û ew weku kurdêk ke rija
Ronî; ew weqte dellê: Kirdime xêrî kurrekan

6
Seqerêkî seferî rahrewî bê tûşe
Xaseten em seferî bedeserî bê tûşe

Be derqey rêge eger Xidrî nebî bê tûş
Kafîye kafî ye kiwa menzilî min bêtûşe?

7
Ya rebbî tu xellaqî ‘ezîmuşşanî
Herçî ke buwe û debê û deyê deyzanî

Min bê xeber im le ewwell û axîrî xom
Hallîm bike lem beyte çî ye însanî?!

8
Beytî Nalî û beytî min ger têkellî yektir deken
Ehmeqî sûretperist û cahîlî me’nanezan

Hacî leklek lek be lek ferqî le gell tûtî heye
Wek hezarî newbehar û bulbulî fesllî xezan

9
Şewkewtî cûtey simêllit take manendî meke
Terkeşî tîrî teja û şîrî destî Rostem e

Rûy le textî rûmetit hênawe bo şanit dellêy
Marî ser şanî Zuhak û dujminî textî Cem e

10
Simtî delerêtewe dellêy dûgî merr e
Gird û sipî û lûs e weku tûrî terr e

Mallêk e eger bida be neqdî dill û can
Xoşit le serî nebî, cehennem bikirre

11
Çûme cergey ehlî dill cergêkî bêdaxim nedî
Nalley bulbul le baxa bê qirrey zaxim nedî

‘Alemêkim dê nexoş û yek kesî saxim nedî
Dûr le merdanî Xuda, xeyrî qurrumsaxim nedî

Şî'rî taktak e

1
Şêx Xefûr bistûme çaçîm pê dellêy,
Çak e min nabim be nuqtey la bela!

2
Curmî min dawênî 'efwî ger nepoşî rojî heşir
'Ebretî min kafî ye bo ehlî mehşer ser be ser

3
Dersî me'nay bê'îbaret merkezî meyxane ye
Hellqey ceng û cîdal xaneqa û medrese

4
Suxrey cînnî tebî'et suxrey 'alem hellê
Wa Suleyman dêtewe kotirfirrênit pê deka

5
Basî zarî to xeyallê bû kira bû hat û çû
Bo çî lêm 'aciz debî qurban le ser hîçî nebû

6
Perdey sîdq û sefa û rastî Adem nedirrabû
Kerbasî xemê bû be qedî bende birra bû!

7
Menzillî me'men nemawe êsteke eyyamek e
Rahetî mumkîn nîye neçîye Medîne ya Meke

8
Sînem degirrê lêm demirrê kelbî reqîb
Em kare weku darî le dû la we gillaw e

9
To xoş debezî espî bezînit pê ye
Min nageme to espî bezînim pê ye

10
Çawekem toş pîr debî, rîşit debête gorewî
Wek bifermûy min filan im pêt dellên tuxwa hewî?

11
Xaneqakey kenefî emin e edebxaney ‘am
Cêy qezay hacet e xellqî be zerûrî deçinê

12
Mudde’î diwênê eger cûnî deda ‘eybî nebû
Şiklîî xoy dîbû le awêne be ‘eksî dewerrî

13
Şêx dellê: Barî rîya şanim cidew naka eger
Kêwî Karux bê; gutim: Sed barekella, ker nebî

14
Mes’eley kuhlî le behpî mebniya teqrîr ekird
Pêy ellêt (.....) ehmeqî ker wa ellê Îbnu l Hîcir

15
(...) Dexîlit bim sema neybird, zewî qûtî neda
Her le beynî ême da bû, em dill axir kêwe çû

16
Ger neçim lêm ziwîr debê weqtê deçim men’im deka
Seyrî ke bêmirwet e çîm lê deka û çîm pê deka

17
Zor segim dîwe feqet nemdî reqîbî hendese
Wez’î namewzûn debê wek xanûy bêhendese